# DILNAME

**7**
**10-6-2011**

*Rojnameyeke Rewşenbîrî ye Serbixwe ye - www.dilname.wordpress.com*


## NÊÇÎRVANÊ HELBESTÊN DILDARIYA WELAT MIHEMED ŞÊXO



**Mihemed Hemo**
*m_hemo03@yahoo.com*
( Hewlêr - Kurdistan )




*bê xebat û kar û bizav*
*bê zanîn û rijêm û rav*
*nabê xudî heq û nav*

**H**unermend û dengbêjê hêja Mihemed Şêxo, bûye kaniya hestên netewî û nîştîmanperwerî di serdema 1970 ê yan û 1980ê yan de, bûye wek pîrekî di paristgeha surûda evîn û eşqa welatê xwe yî zeftkirî ji aliyê kedxwaran ve.
Mihemed Şêxo bi xwendin û stirana wan helbestên nazik û behest dikarî wek: Kewekî gûzel çi kesê ku guh li dengê stranên wî bike bi hêsanî bi tora hastên wî keve, dikarî bi hastên xwe yên tenik ku ji dil û hanav berdidan,- **... Dûmahîk Rûpel:9**

## HEVPEYVÎNEK LI GEL QAÇAXÇIYÊ BERÊ SEYÎD EVDOYÊ BATÊRGIZÎ



**PANZER DERKET QAÇAXÇÎTÎ MIR!..**
**KEFENÊ QAÇAXÇÎ DI STÛYÊ WÎ DE BÛ!..**
**QAÇAXÇIYA BI ROJ MIRINE!..**

**N**avê wî yê nasnameyê Abdulhalim e, lê - dê û bavê wî jî di nav de - kesî ne bihîstiye ku bi wî navî bangî wî kirine! Bi piranî wekî Seyîd Evdo tê naskirin. Seyîd Evdoyê Batêrgizî jî jê re tê gotin. Kevne -qaçaxçiyekî kevin. 20 salên xwe di çûn-hatina serxet û binxetê de derbas kiriye. - **... Dûmahîk Rûpel: 19**

## ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND ( Beşê 3 )




**Şahînê Bekirê Soreklî**
*shahinsorekli@hotmail.com*
( Sydney - Australiya )


**E**m li Erfurt diçin serilêdana xizmine (merîhevalekî almanî. Peyayê malê nuha otomobîleke BMW diajo. Çiqa ji babetên BMW yên herî arzan be jî, ew bi wê serbilind e. Berê, heta ger pereyên xwe hebûna jî, divabû bi salan li benda otomobîleke ji çêkirina DDR (Almanyaya Rojhilat) bimaya, otomobîleke ku xwediyên xwe pê ne serbilind bûn. “Rewş nuha pirr baştir e,” dibêjin mazûvanên me, û “na, - **... Dûmahîk Rûpel: 3**

## WALIYÊ 'SALA ŞEWATÊ' DURZIYÊ ŞAMÊ BÛ


**Xurşîd Mîrzengî**
*axursidmirzengi@free.fr*
( Parîs - Frensa )




**Î**brahîm Têlî bû Mifetîşê Gelemperî, Waliyê Diyarbekir. Şazdeh bajarên Kurdistanê wî îdare dikirin. Piştî derxistina Qanûna Teqrîrîsukûn, Enqerê berpirsiyarî dabû Mifetîş, wî qanûn ji ber xwe çêdikirin... Jina xwe li Enqerê hîştibû û hatibû. Xelkê digot: ‘Bênamûs, jin li wir ji kî re hîştiye û hatiye?… Yên jinik li ba wan e, wan ew kiriye Waliyê Kurdistan… Ne tirk, erebê hêla Şamê ye...’ Xulamê Xetîb Begê Hezroyî Cemo digot: **... Dûmahîk Rûpel: 11**

## GEWRÊ






**Selahedîn Bulut**
( Stenbol - Turkiya )


**W**exta li ber çavên wê destên mêrê wê kelemçe dikin û dişînin eskeriyê, Gewrê hê bûka du mehî ye. Li istasyona trênê ya Diyarbekrê gava ûrînî bi trêna sewqiyatê dikeve, dike fişefiş û bi rê dikeve, ew rûyê xwe bi qerampûşkan xêzxêzî dike, porê xwe tev de hildike, bi tepikan bi çongên xwe, bi kulmikan bi sînga xwe dikeve, bi dû de baz dide, dibêje û dibilîne:
Marê reş, marê reş, te çer xortê mîna beranekî ji xwe re daqurtand û tu çûy!
Ji wê roja ku sebra dilê wê biribûn û bi vir de wek agir di dawê de be, tebatî nedihatê. - **... Dûmahîk Rûpel: 8**

## YÛSIV DIYAADDÎN PAŞA ELXALIDÎ (1842-1906)

**Danerê yekemîn ferhenga Kurdî/Erebî**




**Jan Dost**
*jandost@hotmail.com*
*www.jandost.com*
( Almanya )


**Y**ûsiv Diyaaddîn, kurê qazîyê Meraş û Erzeromê Mihemmed Elî ye, kalikê wî ji hêla dê de, Mûsa Elxalidî, qaziyê Anadolê bû. Wî di biçûkaniya xwe de li camiya El Aqsayê li bajarê Qudsê xwend û pişt re xwest berê xwe bide zanîngeha El- Ezher ya Misrê li Qahirayê, lê bavê wî berê wî da girava Maltayê da ku di fakulta Protistantî de bixwîne. **... Dûmahîk Rûpel: 5**

## ARIYA GOTINA



**Jana Seyda**

*janaseyda@hotmail.com*

( Stenbol - Turkiya )

**R**oj hilat

Weke êşeke nû

Min yekemîn gotinên xwe

Ji te re nivîsandin

Roj çû ava

Weke şahiyeke serjêkirî

Odeya min tijî bû

Ji ariya gotinên te

## WINDABÛN

Tu winda yî di navbera

Azadî û lûleya tivingekê de

Ez jî winda me

Di navbera

Zivistana çavên te

Û payîza evînê de

## TENÊTÎ

Dimeşim

Çavên min kevir bi kevir

Erdê dipîvin

Stûxwar im

Minalekî sêwî me

Li kolanên bê deng

Li pêjna diya xwe digerim

Kesî nabînim

Tu dengî nabihîzim

Ji bilî

Gupgupa dilê xwe

Di tariya bêxewiyê de

Ya kêfxweşiya xewnên

Rengîn

Ji min didize

Li germahiyê digerim

Lê hertim

Li qeşayê dilikumim

Tîp ji ber min direvin

Û di deştên perîşaniya

Rojên min de

Dibin toz

## HELBESTEK

**Pertew Begê Hekarî**

( 1777 - 1841 )

( Hekarî - Turkiya )



**M**e dil bû agir û nîran[1] e dîsa – ceger jê taze min buryan[2] e dîsa

Neşêm êdî ewan derd êt ku bê ћed[3] – bikêşim lew bi derb[4] û jan e dîsa

Nebûme ez ji weslê[5] ber *xwe rê kam* – xuya be wê ji nû buћran[6] e dîsa

Ji xeyrî dax ê xem nîne dewayek[7] – ku ser da derd ê bê derman e dîsa

Dil ê min kase[8] ya serpoşî-dar[9] e – tijî derd û xem û kovan[10] e dîsa

Li sîngê dit hero sed şûşe yê 3ehd[11] – ji nû va yim dikit peyman e dîsa

Perîşan im ji wê zulf[12] a perîşan – bi pêç û ћelqe[13] wek davan e dîsa

Dil ê min lew li ateş[14] çûn sipende – li rûyan xal ê 3enber[15] dan e dîsa

Qe napirsit çi ye hal ê te Pertew – weha bê sebr û bê saman[16] e dîsa

** Jêder: Ji danhevên Ebdil-Rehmanê Kurimî ( 'Evdî )*

1- Nîran: Agir. 2- Buryan: Biraştî.

3- Hed: Sînor. 4- Derb: Lêdan.

5- Wesil: hevdîtin, pêrgîn.

6- Buhran: Kêfxweşî ya herî xurt, neşwet.

7- Dewa: Derman. 8- Kase: Peyal, îskan.

9- Serpoşî-dar: Nuxamtî, ser girtî.

10- kovan: Jan, êş, azar. 11- 3ehd: Peyman, soz.

12- Zulf: bisk: Por ê keçan yê dirêj li ser cênîkan.

13- Helqe: Xelek, çîne. 14- Ateş: Agir

15- 3enber: Şima ya bihin-xweş ( ku ji hundur ê nehingekî peyda dibe ).

16- saman: pere, maldarî, hebûn

## ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND

**( Beşê 3 ) ... Dûmahîk:**

-em xweziya xwe bi demên DDR nahînin, lê çend aliyên wê yên erênî hebûn." Ew ji xaniyê xwe, ji bernameyên televizyonê yên cudaşêwe, ji kompiyûter û înternêtê, lê ber her tiştî ji rewşa azadiyê ya nuha gellekî razî ne.

Yekbûna her du beşên Almanyayê her weha gellek kêşeyên din bi xwe re hanîn holê. Bi hezarn ji almanên ku di salên şerê cîhanî de, yan li dû dawiya wî şerî ji 1945an û şûn ve, reviyabûn rojava, li dû dawîhatina DDR vegeriyan û daxwaza zevî û xaniyên ku berê yên wan bûn kirin. Hinek ji van kêşeyan hîn berdewam in.

Li Erfurt û bajarên din yên vê herêmê hejmara biyaniyan ji ya bajarên herêmên rojava pirr kêmtir e. Lê em di kolanekê de navê *Kurdisches Restaurant* dibînin û ez dibêjim hevalên xwe, "Em ê şîva xwe li vir bixwin." Xwediyê Xwaringeha Kurdî bakurî ye, piçekî fedok e, heye ku ji ber wê yekê be ku kurdiya xwe ne weqa baş e. Mirovekî zimanxweş e, em li halên hev dipirsin... Pîzayên wî jî xweş in.

Ji Erfurt wê de em serîkî li kampa dengbed *Buchenwald* dixin. Almanya 60 salan li dû dawîhatina recîma Hitler hîn jî di bin siya siyaseta stemkar ya wê recîmê de dijî û ji ber ve şermezar e. Aliyên derveyî, bi taybetî Cihû, lê her weha beşekî ji Almanan bi xwe, nahêlin ku va welata zû bi zû salên di bin desthelatdariya recîma nazî de ji bîr rake. Stemkariya li Cihûyan bûyî ne tenê di pirtûkxaneyan de, di dokûmentan de û di nav siyaseta rojane ya hukûmetên almanî de dihêt şermezarkirin, lê bi ser de şûnên ku tê de Cihû hatine bicîhkirin û kujtin parastî mane, bûne şûnên serilêdanê ye. *Buchenwald* yek ji wêneyên reş yên recîma nazî raber dike. Ev kampa ku tê de yên li dij recîma Hitler, rewşenbîrên li dij Naziyan, Cihû û Qereçî dihatin bicîhkirin li devereke gellekî bedew, li nêzikî bajarên Weimar û Erfurt di nav daristanekê de di sal 1937 de hatiye çêkirin. Di kampê de her weha kesine oldperest û kesine homoseksuel jî girtî bûne. Ji sal 1937 ta sal 1945 dora 250 000 girtî di vê kampê de hatibûn bicîhkirin, yan bo demekê tê de mabûn. Ji wan 50 000 tê de miribûn. Hema ber gihîştina hêzên amerikî di rojên dawîn yên recîma nazî de, hêzên taybet yên Hitler (SS) 28 000 girtî rastî mirinê kiribûn, lê 21 000 girtiyên din, 900 ji wan zaro û ciwanên temençûk, di rewşeke perîşan de zindî hatibûn dîtin. Şûna ku mirovî li vir rast dixe bin janeke hindirîn odeya firneyên şewitandina mirovan e. Li vir mirov ji mirovahiya xwe şerm dike, çimkî stemkarên mirovkuj jî wek wî "mirov" dihên hesibandin. Li nêzikî kampê karbidestiya DDR şûneke ji bo şermezarkirina recîma nazî çêkiribûye. Hîn jî li ser beşekî wê va durişma heye: ***DDR ê wê yekê misoger bike ku kesekî nazî, kesekî nijadperest û stemkar li vî welatî nemîne***. Gotineke qenc e, lê ya balkêş ew e ku li dû têkçûna DDR li Almanyaya îroj yên herî nijadperest li wan deveran dimînin ku berê di bin desthelatdariya DDR de bûne. Ligor agahiyên bo me hatinî dayîn, Kampa *Buchenwald* ji sal 1945 ta 1950 ji aliyê hêzên sovyêtî ve jî hatibûye bikarhanîn, ji bo bicîhkirina girtiyên siyasî…

Di xeleka 4emîn û dawîn de em ê biçin Weimar.

## TÊBÎNEK*



**Rozad Elî**
*rozadeli@yahoo.com*
( 'Efrîn - Sûriya )

**D**esteya birêvebirina rojnameya ''Dilname''..

Silav û rêz

Spas ji bo rojnameya we ya hêja…

Têbîneke min li ser vê hevoka ku li bin navnîşana rojnameyê heye: (( Dilname.. rojnameyek rewşenbîrî ye swerbixwe ye )).

Di baweriya min de, gerek e ew hevok wiha bê nivîsandin: ((Dilname.. **rojnameyeke** rewşenbîrî ye swerbixwe ye)). Ango gereke veqetandeka navdêra nependî ( **e**) bi dawiya navdêr ''Rojnameyek'' ke ve, ji ber wek win jî diznin, ew ((cinava qersene ''ye'')) ya ku li paş rengdêra ''rewşenbîrî'' hatiye, ew ji bingeha xwe de ji veqetyandeka navdêra ''Rojnameyek**e**'' hatiye û wê navdêrê dinimîne. Lê di we di wê hevokê de cinava qersene aniye, û navdêra ''rojnameyek'' jî bê veqetandek nivîsiye, ez dibînim, ku ew jî ne li gora rêzikên rêzimana Kurdî ye. Di baweriya min gengazî heye ku ew hevok tenê bi du şêweyan were nivîsandin, ew jî ev in:

1. Rojnameyek rewşenbîrî **û** serbixwe ye.

Yan jî:

2. Rojnameyek**e** rewşenbîrî ye serbixwe ye.

Spas ji bo hemî karbidest û nivîskarên Dilnameyê.


**Rozad Elî**
**( Efrîn: 17.5.2011 )**

---

***** *Edîtoriya Rojnameya Dilname spasiya rêzdar Rozad Elî li ser têbîniya wî dike, her weha têbîniyê cihê xwe dît û ew şaştî hate serastkirin.***

**Rojnameya DILNAME**

## BAWERÎ



**Berken Bereh**

( Amed - Turkiya )

**P**êr Elî

Duh Rizgo

Îro jî Casim

Zanim,

Nêzîke

Wê dor were min,

Warek xalî

Dinyayek tarî

Bikin para min.

Lê

Mirin

Wê nebe

Dawiya jiyana min!

## GER HÛN BIXWAZIN

Ger hûn bixwazin

Xizaniyê binasin

Şevek li gundê min bibin mêvan

Ger hûn bixwazin

Mirinê binasin

Li baskên qulingên koçber binihêrin

Bêhna şewatê tê ji wan

Ger hûn bixwazin

Evînê binasin

Taldeya rojhilata dilê xwe bipelînin

Bê çawa bi ken diteyisin stêrk

Ger hûn bixwazin

Welatê min binasin

Vekin deriyê agir û rojê

Çivîka mirovheza heftreng

Dê bifire ber bi we

## ENSTÎTUYA KURDÎ LI WAŞINTON Ê ( WKI )




**E**nstîtuya Kurdî li Waşinton ê sazîyeke zanîn û lêkolînê ye ku di Êlûn a 1996 an de li paytext a Emrîka hatiye damezirandin. WKI xwe daye ber van armancan: Ronîkirina dozên girêdayî millet ê Kurd ji ray a giştî re, parastina mafên Kurdan yên mirovane û siyasî û çandî, alîkariya mirovane û pêşxistina civaka sivîl, jêderên bo çand û zanîna Kurdî, piştgiriya çare yên bikêrhatî bo dozên Kurdan.

WKI karek berve pêşxistina van aliyên taybet kiriye: Zanîn ( korsên zimanê Kurdî, belavkirina nûçe û agahiyan ), tevgerên mirovane ( dermankirin, û lêkolîn û rahênanên bijîşkî ), Amadekirin û berteka dij bikaranîna çekên kîmyayî, Tomarkirin a belgeyî ya tendurustî ya cîgehê.

**Dr. Necmeddîn O. Kerîm**

**Serokê Enstîtuya Kurdî li Waşinton ê**



Damezirînerê WKI û serokê wê Dr. Necmeddîn O. Kerîm e, ji Kurdistana 'Iraqê bajarê Kerkûkê ye, yek ji birêvebirên Enstîtuya Kurdî li Parîsê ye jî û gelek saziyên kurdan li hindir û derveyî welêt.

## YÛSIV DIYAADDÎN PAŞA ELXALIDÎ ... Dûmahîk:



Du salan li wir ma heta birayê wî Yasîn ew şande Stenbolê da ku bijîşkiyê bixwîne, lê dilê wî û wê xwendinê nebû, îca piştî salekê dev jê berda û tev li fakulta Robert a Endazyariyê bû. Sal û nîvekê li wir xwend û ew jî bi hoyê mirina bavê xwe, terikand û vegeriya Qudsê. Dema ew li Stenbolê bû destpêkirina vekirina dibistanên nûjen û modern dît û xwest li Qudsê jî tevgereke wiha bike. Bi alîkarîya Raşid Paşa waliyê Sûrî sala 1867'an de, yekemîn dibistan bi navê Dibistana Reşîdî vekir. Lê hêviyên wî hemû têkçûn dema gerînendeyekî tirk ji Stenbolê anîn û ew nekirin gerînende.
Piştre ew bû Serokê Şaredariya Qudsê û şeş salan di wî karî de ma. Di wan şeş salan de gelek xizmet ji bajêr re kirin, kolanên nû ji bo peyadeyan çirandin û rêyên asfalt ji bo erebaneyan di navbera Qudsê û Yafayê de û kehrîzên zêrzemîn û gelek karên din. Piştî demekê ew ji serokatiya şaredariyê hate pekandin.

Sala 1874'an de dostê wî Raşid Paşa bû wezîrê karên derve yê dewleta Osmanî, û ew vexwend Stembolê da ku wekî wergêrekî di Babi Alî de kar bike. Di wergeriyê de şeş mehan xebitî û piştre bû cîgirê Qonsolosê Osmanî li bendera Botî ya Rûsî li kenarê Derya Reş.

Lê Raşid Paşa di wezareta derve de dirêj nekir û Yûsiv jî bi wî re ji karê xwe hate avêtin. Wî ew yek wekî fersendekê dît ku li Rûsyayê bigere û ji nêzîk ve wê nas bike. Ew li bajarên wekî Moskov, Kiyev, Odîsa, Petesrburg heta sala 1875'an geriya.

Piştî wê bi alîkarîya dostê xwe yê kevin Raşid Paşa yê ku bûbû Balyozê Dewleta Osmanî li Otrîşê (Nemsayê) bû mamosteyê edebiyata erebî li Viyanayê.
Gelawêja 1875'an de ew vegeriya Qudsê û careke din bû serokê şaredariya wî bajarî. Di destpêka sala 1877'an ew wekî mebûsê muteserrifiya Qudsê, di Meclisa Mebûsan de hate hilbijartin. Ji filestiniyan ew bi tenê nûner bû, û ji çardeh nûnerên ereb bû. tevaya nûnerên meclisî mebûsan jî 120 kes bûn.

Di meclisê de wî dijberiya Siltan Ebdilhemîdê duyem kir û bû piştgirekî çalak ji bo destûrê (meşrûtiyetê). Ew yek ji dostên Cemaleddîn Elefxanî bû, ku ew jî di dawîya sedsala nozdehan de li Istanbulê bû. Li gor ku çavkaniyên dîrokî dibêjin, ew mirovekî cesûr û wêrek bû û bi dilêrî rexne li Sultanê sor( Ebdilhemîd) dikirin û di rojnameyên wê demê de behsa wî û daxuyanîyên wî yên di meclisê de dihate kirin. heta ku qonsulusê Emerîka bi xwe jî behsa wî kiribû û gotibû: wî di meclisê de bahozek bi cegermendiya xwe rakir, ew mirovekî jîr û zana ye, ew di gel ku misilman e jî , lîberal e û di dêreke xaçhebînên yûnanî de dijî.

Dema ku meclis bi biryara Siltan Ebdilhemîd di reşemiya 1878'an de hel bû, ew jî bi deh mebûsên din re hate sirgûn kirin û vegeriya Yafayê û piştre Qudsê û ji bo cara sêyemîn bû serokê şaredariyê. Sala 1881'ê de bû qaymeqamê Yafa û piştre Merciuyûn li Lubnanê. Di dawî de bû hakimê Mutkî li Bedlîsê û li wir fêrî zimanê kurdî bû û ferhenga xwe ya navdar "Elhediyye Elhemîdiyye" nivîsî. Ferhenga wî di sala 1893'yan de li Stenbolê çap bû. Hin dibêjin ku wî navê ferhengê kiriye Elhemîdiyye da ku destûra çapê werbigire, ji ber ku wateya navê ferhengê ev e: diyarîya hemîdî di zimanê kurdî de!! Lê ez ne bi vê nerînê re me, çiko me dît bê çawa ew dijberekî mezin bû ji Sultan re û destên wî jî dirêj bûn, ango dikarîbû ferhenga xwe li Viyannayê çap bike bêyî ku stuxwariyê ji sultanê sor re bide xuyakirin.

Sala 1893 ku ferheng tê de çap bû, kovara rojhilatnasiyê ya ku bi zimanê firensî derdiket(( Journal Asiatique)) jî behsa wê kir.

Her weha ew bi coşeke mezin ji hêla rewşnebîrên kurdan ve li herêmê hate pêşwazî kirin û gelek kesan mîna: Hesen Fehmî Efendî muderrisê dibistana Salihiyyê li Sêrtê, û Şêx Evdirrehman kurê miftiyê Sêrtê û Mele Mistefa kurê Şêx Hesenê navborî û hin kesên din, ku hemûyan jî helbest di pesnê wî û ferhenga wî de nivîsîn.

**Hesen Fehmî dibêje:**

**Extera Qudsê Yûsiv paşa**

**Rastgoyê dewletê xwedanê hinerên navdar**

**Xwedayê alemê bide wî, wî rêyeke serbilindiyê vekir.**

Her weha şêx Evdirrehman kurê miftîyê Sêrtê di pesnê wî û ferhenga wî de weha dibêje:

**Şêrîntirîn pirtûk e di zimanê kurdî de**

**Her tişt di nav de ye û di ser her pirtûkî re ye**

Erê, rewşenbîrên kurd yên wê demê( ku mela û miftî û şêx bûn) bi germahî çûne pêşwazîya wê ferhenga giranbiha. Ne tenê wisa lê wan alîkariya daner kiribûn û berê wî dabûne peyvên kurdî yên resen ku Daner bi xwe jî keda wan ji bîr nekir û navê wan melayên ku alîkarîya wî kiribûn, yeko yeko di rûpelên ferhengê de nivîsîn e.

Di vir de pirsek xwe dihavêje kevîkên pencereya mejîyê mirov, ew jî ev e: gelo çima wan melayan bi xwe, xwe nedane nav wî karê hêja û wan bi xwe ferheng ji bo zimanê kurdî nedanîn? Di nerîna min de danîna ferhengeke bi wî rengî û di wî zemanî de, bi hewceyî mejîyekî akademîk bû, ku mixabin e wmejî li ba zanayên me kurdan nebû. Hêjayî gotinê ye ku ferhenga Elhediyye Elhemîdiyye ya ku Dr. Muhammad Mukrî weşand, û li Lubnanê çap bû, bêyî pêşgotina daner bû. daner pêşgotinek di pesnê Sultan Ebdilhemîd de, û derbarî rêzimana kurdî û helbestên Ehmedê Xanî de, nivîsî bû. ji ber vê yekê ez dibêjim ku pêdivî bi çapeke nû heye ku jiyana daner û pêşgotina wî dîsa cih bigirin.

Ferhenga Elhediye elhemîdiye ferhengeke ku gelek peyvên kurdî yên resen ji windabûnê parastin e, ew hêjaye ku hîn bêtir li ser were xebitandin û hemî peyv û gotinên di nav de, cihên xwe di ferhengên nûjen de, her wisa di nivîsên her nivîskarekî kurd de cih bibînin.

**Elxalidî Kurd bû yan na??**

**... Dûmahîk Rûpel: 6**

## YÛSIV DIYAADDÎN PAŞA ELXALIDÎ ... Dûmahîk:

Elxalidî ji binemala Xalidîyan e ya ku ji zû de li Qudsê bi cih bûbûn. Vê malbata mezin jî tucarî negitine em kurdin û tu belgeyên dîrokî di destê me de nînin ku dibêjin ew kurdin. Ji ber vê jî ne ji mafê me ye ku em şerwelekî kurdî li bejna danerê ferhengê bikin. Ew mirovekî Ereb, lê ji zimanê kurdî hez kiribû û jiana kurdan ji nêzîk ve dîtibû û li pey xwe ji bo me kurdan ferhengeke hêja danî, îca kurdbûna wî û nekurdbûna wî tiştekî naguhere.

Yûsiv Diaeddîn paşayê ku ev xizmeta mezin ji bo zimanê kurdî kir, sala 1906'an de li Stenbolê wefat kir. Jêrenot:

Wêne, wêneyê daner e. ji malpera xalidiyan hatiye wergirtin.

Resim 1: kopîya nameyeke danerê ferhnegê ye, ji konsolosê giştî yê Rûsyayê, li sûrî û Filistînê re şandiye. Di vê nameyê de ew spasiya konsolos dike, çiko konsolos bi xwe spasnameyek bi munasebeta derketina ferhengê ji wî re sala 1894 an şandibû.

Resim 2: nameya daner ji Idward Siega re, ku sala gerînendeyê Bîroya Imperatorî ya Almanî ya rojhilatê li Berlînê bû. di vê nameyê de daner spasîya Idward Siega dike ku wî pesnê ferhenga Elhemîdiyye kiriye, û jê dixwaze ku nivîsên wî yên derbarî ferhengê yên di kovarên wê demê de hatibin weşandin, jê re bişîne.

*Jêder:*

*Navdarên Kurd û Kurdistan di serdema Islamî de- Mihemed Emîn Zekî. Çapxane ya el Tefeyyuz- Bexdad 1945.( مشاهير الكرد و كردستان في العصر الإسلامي. محمد أمين زكي )*

*Malpera malbata Xalidîyan. www.khalidi.info.*

*Hilperîna kurdan ya çandî û netewî di sedsala nozdan de. Pr.Dr. Celîlê Celî. Wergerandin ji rûsî: bavê Nazê. D. welato. Beyrût. Lubnan 1986 ( نهضة الأكراد الثقافية و القومية في القرن التاسع عشر. البروفيسور جليلى جليل. ترجمة بافى نازى. د. ولاتو. )*

*Elhediyye elhemîdiyye. Pêşkêşkirin û lêkolîna: Dr: muhammad Mukrî. Beyrût lubnan. Çapa duyem 1987. ( بيروت لبنان. الطبعة الثانية الهدية الحميدية في اللغة الكردية يوسف ضياء الدين باشا الخالدي المقدسي )*

## JI DILÊ TE RE DISTIRÊM




**Mehmûd Badilî**

*mbadili3@hotmail.com*

( Hesekê - Sûriya )

**"Diyarî pakrewanên azadiyê dikim"**

**D**ilberê..

aniha bi te re diaxivim

û neyar kujtaran

di devê min de

dijenînin.

Aniha..

sitêran di porê teyî

şevînî de vêdixim

gulan bi guhên xewna

te ve vedikim

û neyar derziyên mirinê

di kulêmekên hêviyên

min de dadiçikînin.

Aniha..

vê sirûdê

-evîndarên azadiyê

bibin yek-

ji tilîyên te re dirêsim

û neyar henasên pênûsa min

bi sêdara tariyê ve dadiliqînin.

Aniha..

dilê xwe ji sibehên te re

dikim taştê

û neyar saw û tirsê

di kezeba roka min de diçînin.

Aniha..

sînga xweyî tazî

ji çêreya tîrêjên dêmên te re berdidim

û neyar top û gulleyên qirkirinê

di hindirê min de diteqînin.

Aniha..

di pêşwaziya te de

xwîna xwe ji te re radixim

û neyar peyalên kenê xwe

ji golên arezûya min dadigirin

û li ser cendekê min

noşa kêfxweşiya xwe bikartînin.

Aniha..

giyanê xwe datînim ser

destê ba

û diyarî çavên te dikim

û neyar pîlan û nifirên xwe

di kunîleyên laşê min de gur dikin.

Aniha..

ji dilê te re distirêm.

Aniha..

ji çavên te re

pencereyan di giyanê aliyan de vedikim.

Aniha..

bi tilîyên xweyî ewravî

barana ji porê te dibare

şeh dikim.

Aniha..

bi xatirê te

çiku piştî aniha

neyar teşiya jîna min

li ser çi çogê dirêsin

nizanim..?

Dibe ku aniha..

gorekê ji termê min û welêt re

dikolin..!!

dîsa nizanim.

# PÊXEMBERÊ AZADIYÊ



**Keça Kurd**

*kecakurd50@yahoo.de*

( Dortmund - Almanya )

**De** lorî, lorî piçûkê mino lorî

Hemzayê mino kesara dilê dayê

Lorî lorî

Deng û basên li vê rojê gihane min

Ji çar goşan

Gurzê tîran ji kevanan derdikevin

Ji wan re ez bûme nîşan

Sing û pişta min kun kirin

kezeba min tev dibirin

Li nav kûrha derûnê xwe bê hedarim

Ez nizanim evê xwîna li cirnikê dilê xwe ez

bi çi lêvan wê mijim?

Pê hevîrê lorandina xwe bistirhim

Peyverengên lorandina xwe ji kudê peyda bikim?

Ji kuştara bajarê Hema

ji nav gorên goristana bêkêl

û serwinda

rengê li kolanên Helebceya şehîd

Ezê li xurtiya pêlên ava assî

rengên li birînên piçûkê xwe

lorîka xwe bihûnim

Ezê dergûşa êş û janan

Dergûşa nalîn û hawarên piçûkê xwe bi hejînim

Bi derzîka li nav destê dayê

Bi hevrîşmê hestên dilovanî

Kûrbirînên reşqemirî

yên di laşê ciwanê xwe de

bi tabiskên keserên xwe bihîvêzim

Ji wê xwîna li kolan û li kuncikên bajarê xwe

Rengê sorî xecxecokên li ser lêvên hemzayê xwe

biguvêşim devê pêlan

da ku ava çemê Assî

Pê sor bikim

Lorî lorî piçûkê mino lorî

Çavên dayê li rêbwara te qerimîn

Dilê dayê ji çar goşan her lê dida

Şev û rojan taya tirsê ez digirtim

Li nav çola biyabanê

Winda dibûm

Ez tihniya pêzanînek

Li ser cih û warê te bûm

Li taxikên bajarê min şopçî nebûn

Hemî calde

deryên bajêr tev girtî bûn

Li gevzeka vê kuştarê

Debabe û rivdên guran Şebbîhe bûn

Min baz dida bişûn

siha reşê xwe de

Lê bergeha lêgerîna bişûn te de

Li dayikê qedexe bû

Lorî lorî piçûkê mino lorî

Dayika te bigorî

Hindê caran reşê tirsê,

pîrehovka bêhêviyan

Pencên xwe j min divekirin

Demek ji min dûrdiketin

Bazikên xwe bi lawazî

berbi jor ve min radkirin

Li raberî yezdanê pak

bi hêvî bûm

piçûkê min li temenê sêzdesalî

bêgunehe

Li ser çengên firîşteyan

dê vegere

Xwe bavêje hembêza min

Ji gerdena wî a sipî

dê bimijim xwêhdana wî

Hilma ji nav derûnê wî

li pozê xwe hilkişînim

Min got hewrê li asmanê hêviyên min

dê bibare

dê av bide gulistana jiyana min

Min nezanî biçûkê min bêoxire

li nav pencên rivdeguran

bêpirgal e

Goştê laşê wî dveçirin

Ne hawar û nebergir e

tak û tenha tim dinale

Min nezanî Hemzayê min

Wekî îsa pêxemberî

nûraniye

Pêxemberê azadiyê

Hêza xurtî şûreşê ye

Min nezanî

ku nameya Xwedayê pak a pîrozî

ji bo mirna van Firewnan

li gel wî ye

li gel wî ye

**( 5. 6. 2011 )**

**GEWRÊ ... Dûmahîk:**

Wexta li ber çavên wê destên mêrê wê kelemçe dikin û dişînin eskeriyê, Gewrê hê bûka du mehî ye. Li istasyona trênê ya Diyarbekrê gava ûrînî bi trêna sewqiyatê dikeve, dike fişefiş û bi rê dikeve, ew rûyê xwe bi qerampûşkan xêzxêzî dike, porê xwe tev de hildike, bi tepikan bi çongên xwe, bi kulmikan bi sînga xwe dikeve, bi dû de baz dide, dibêje û dibilîne:

Marê reş, marê reş, te çer xortê mîna beranekî ji xwe re daqurtand û tu çûy!

Ji wê roja ku sebra dilê wê biribûn û bi vir de wek agir di dawê de be, tebatî nedihatê. Tama devê wê xera bibû û tu tişt pê xweş nedihat. Ji xwarin û vexwarinê ketibû. Xulqê wê bûbû wek jehrê. Kesî newêrîbû li halê wê bipirsiya. Hinan jê re bigota : Tu çawan î wekî dijûn lê dabin, pê tade dihat. Hela bi xwesûya xwe re qet li hev nedikir. Ava her duyan di coyekê de nediçû. Di malê de her roj şer û pevçûn bû. Qederek wilo derbas bû. Nizanîbû wê çawa bike. Lê baş tê gihiştibû ku bêmêrtî gelekî zor e. Bi şevê ranediza. Xew lê herimîbû. Di nav cihan de ji êvarê heta destê sibehê xwe vir de û wê de diqulipand.Doşek pê fireh, balgîf pê dirêj û lihêf pê mezin dihat. Li ser balgîfê li şûna serê mêrê xwe dinêrî û heta di ber kêlan re perîk bifiriyana bi kulmikan pê diket. Xewa bûka teze di binê lihêfa rijî de êdî nedihat. Derdiket nav gund, bê armanc xwe vir de û wê de zîz dikir.Roj bi roj, bi jimar tam du sal derbas bûbû. Lê ji mêrê wê tu xeber tune bû. Li kû bû, sax bû, mirî bû nizanîbû. Li gund qala herba Koreyê dibû. Lê rojê tiştek dihate gotin. Wê jî nema zanîbû kîjan rast e. Tenê rastiyek hebû ku Gewrê êdî nema bi xwe karîbû. Serê sibehekê, bi banga dengê melê re, çaxa bi xwe hesiya lingê xwe li lihêfa ser xwe da û çen kir wî aliyê odeyê. Rabû ser xwe, sînga xwe derxist derve, tiliyên xwe di nav hev re derbas kirin, destê xwe di ser serê xwe re qulipand, xwe vir de û wê de vezeland, tajan da xwe û movikên pişta xwe yek bi yek qirpandin.

Paşê xwe hup kir ser dikê û ji wir jî xwe çip kir ser sindoqê. Tiliyên xwe çirpandin, li çepikan xist, du sê deng lîlandin, reqisî û di hundirê odeyê de, da çindikan. Lê tîna dilê wê nedişikest. Derî vekir û xwe avêt derve. Dîk û mirîşkên li hewşê ku li dora hev diçûn û dihatin ji ber bayê wê tev bi hewa ketin. Çûkên li ser qûmaxên xênî, wek dengê şîrqîniya kevkaniyekê cube wan, matmayî li dora xwe nêrîn. Gewrê kulîmekên xwe dagirtin, sînga xwe da pêş û di nav teyr û tebayên ecêbmayî re meşiya. Cotê memikan serî jê stendibûn û nedihatin zeftê.Dihezikîn û bi bihostekê li pêşiya wê dimeşiyan. Serê wan wek serê kevokên li ser avzêmkan, ji bo ku ava di devê xwe de daqurtînin di ser xwe re li Xwedê dinerîn. Kevir û kuçên li ser rê xwe li ber pêkên wê nedigirtin. Her ku gavek diavêt sê çar şûjik ji ber pozika sola wê dipengizîn qeraxên rê. Çûkên li nav gund wek başokan dadabin wan, vir de û wê de difiriyan. Yên li ser daran, ji ser şaxikên nizm difiriyan ser şaxikên herî jorîn.

Li ser tenûrê kurtepista pîrekan bû: ' Xortên me yên azib, yên ku îro meşa vê qehpikê dîtibin, gişt ê doza zewacê li me bikin'

' Ma hew yên azib?

' Gişt êdî hema wê tajana bidin xwe...'

' De bila tajana bidin xwe, bila zû bizewicin ji bo ku çavên wan ne li der bin'

' Bi Xwedê qismê zilaman baweriya min bi wan nayê, zû jî bizewecin û dereng jî bizewicin wexta qehpikekê bibînin bi dû dikevin.'

Xwesûya Gewrê gava li bûka xwe dinêrî ciwaniya wê dihate bîrê. Gunehên ku di taldeyan de kiribû, yên piçûk û mezin gişt di ber çavên wê re dibihurîn. Çil sal ji emrê xwe diavêt û diçû pazdeh saliya xwe. Wê wextê keçikeke ciwan bû, xweşik û bedew bû. Di nav gund de xwe li ba dikir û digeriya. Çaxa hubriya li ser serî li şaxikên daran dialiqî û di ser porê wê re dişemitî, wê tew li xwe danetanî ku hema li dû xwe bizivire. Wexta dihate bîrê ku xortên gund ji ser şaxikên daran hubriyên wê didane hev, destê xwe di hev dida û dikeniya. Taldeyên kokên daran, paş bendên rezan, qorzîkên xaniyan, nizarên zinaran, xirbeyên terkkirî, yek bi yek dihatin bîrê. Di ber xwe de : ' Xwedêyo! Tirs û heyecana hevpeldanên bi dizî çiqasî xweş bû!' got.


Wexta dikete xeyalên qîzîtiya xwe, xwîna wê ron dibû, germahiyek li ser canê wê bela dibû, sorayî bi rûyê wê diket, aveke Şîrîn li ser zimanê wê dida der, lêvên wê yên pûç şil dibûn û dilê wê nerm dibû. Xeyalan tesîr li dilê wê dikir û têkiliyên wê yên bi bûkê re hebekî baş dibûn. Lê lihevhatina wan zêde dom nedikir. Wexta li wê bi gumanî hawena diket, dilkoçeriyên wê didît, wê çaxê bêhna wê teng dibû, ew xwesûya nermokî diçû, hişkoleke no dihate şûnê. Qinyateke wilo jê re hasil bûbû ku, vê bûka teze neyê tirsandin wê hetîketiyeke mezen bi ser xwe û yê wê de bîne.

Du kurên wê yên zamote hebûn. Fikirî û got: ' Ma ew ji bo kîjan rojê ne?' Şand pê wan û gazinên bûkê ji wan re kir. Her du kurê xwe tehenandin,sor kirin û bi ser bûkê de şandin. Kurên wê filitîn bûkê. Wek di curn de dan bikutin ser û canê wê bi kulmikan, bi daran di ber hev de kutan. Pê li serê wê kirin, di binê lingên xwe de eciqandin û bi guliyên porê wê girtin û wan ew bi xwe re kişand. Li hewşê wan gewdê wê bi hewa xist û wan wekî berateyekê ew çend kir ber lingên diya xwe. Gundî piçûk û mezin û pîrek gişt ji malên xwe derketibûn, temaşeya lêdana Zamoteyan a li Gewrê dikirin.

Lê ne ji çê û ne ji xerab kesî jê xeber nedida û hayên xwe jê nedianîn.Gewrê wekî pisîkek heft ruho dimir û her care ji nê ve ruh pê de dihat. Rabû ser xwe, delkek da xwesûyê, serê xwe bilind kir, kulîmekên xwe şidandin, destê xwe da paş xwe, sînga xwe derxist derve û weke şivterkekê xwe li nava koma temaşevanên gundiyên bêdeng xist û meşiya. Gundî gişt revîn, ketin malên xwe û deriyên xwe girtin. Çûkên li ser riya Gewrê yên ku di nav şûjikan de li hebikan digeriyan, wexta çav li Gewrê ketin wek dest bi dest çifteyek bi wan de teqiyabe hebikên ceh û genimên di nav nukilên xwe de berdan, baskên xwe vekirin û bi hewa ketin.

## NÊÇÎRVANÊ HELBESTÊN DILDARIYA WELAT MIHEMED ŞÊXO ... Dûmahîk:

-xwe berde fayîlê hasten her merovekî û pê hukim bike. Lom di rewşek tal tal de bi awaz û peyvên helbestvanên kurdperwer û welatparêz astê muzîk û stirana kurdî bilind û berve pêş bir û jîyana gelê xwe bi wê berxwedanê şêrînkir. Mînakek:




**Pêşkevin em serfirazin miletê Kurdî**

**Yan mirin em dê bibînin yan jîna kurdî**

Mihemed Şêxo di jîyana xwe de di du qonxên mezin re derbasî qada hunerê kurdî bû ye û cihkî bilind tê de girtî. Ew qonax yek çûna wî ya Libnanê ye, ya du jî çûna nav Şoreşê Êlûnê ye.

Mihemed Şêxo yekbû ji nifşên pêşengên stirana şoreşgerî û nîştîmanperwer ku di sala 1968 ê de dest bi stiranê kirî, li destpê bi zimanê Kurdî û Erebî stiran gotine, bi kurdî stiranên gelerî stirane, bi Erebî jî stiranên Mihemed Ebdilwehab, Ferîd Etreş û hin din stiran. Piştî dest bi stiranê kirî bi salekê xwe ji partiya dîmqratîv nêzîk dike roj ji rojê êşa miletê xwe dide der. Li xweşiya rijêma Sûrê nayê, çinkê rijêma Sûrî jî di wê serdemê de, li dijî gelê kurd di kurdistana rojave de dest bi pirojeyên xwe yên şofonîst û qirêj kir bû. Rijêma Sûrî nedixwast gelê Kurd huşyarbe. Lom fişar dabûn ser ronakbîr, helbestvan û hunermendên Kurd, ji ber wê yekê û hin sedemln din M Şêxo berê xwe daye Beyrûtê, welatê Libnanê, ew sedem jî ev bûn:

1- deshelata rijêma Şofînîsta Sûrî rê li ber hunerê kurdî dibrî û rê nedidan hunermendên Kurd ku hunerê xwe bi azadî bi karbînin.

2- Libnan welatekî azad û qeştûgûzerî bû, salane bi dehan mehrecanên hunerî yên mezin, li wir bi rê ve diçûn. Loma Libnan bûbû serkaniya hunerê Erebî û hunera nîvdewletî.

3- Libnan welatekî Dîmuqrat bû kurdên li wir dikarîn bi gotana em kurdin û nûnerê Şoreşa Êlûlê jî li wir hebû. Loma Hunermendên Kurd qesda Libinanê dikirin,

Gav hunermend M Şêxo qesda Libnanê kir, li wir ket qonaxek nuh û bi şêweyekî nûjen huner û muzîk nasî, ji aliyê awaz û peyvê ve gavin berferehe avêtin.

Çinkê hîn zimanê qelemê rewşenbîrê kurd yê bi nav û deng nemir Kamîran Bedirxan li Libnanê ziwa nebûbû, hîn bêhna tîpên rojnama Jîna Nû li wir diforî, hîn wê dengê beşê kurdî ya êzgeheha Libnanê di guhên Kurdên Libnanê de mabû, dezgehên kurdî di Libnanê de dihatin dîtin wek: Cemhîya Xêrî ya Kurdî ya Libnanî û cemhîya Eriz ya Libnanî. Nivîskar û helbestvanin Kurd qesda Libnanê dikirin û li wir dijîyan mîna; nemir Birahîm Metînî ê û yên din, ronakbîrên Kurd dikarîn li Libnanê pirtûkên xwe çap kirana û bidestxistana, hin hunrmendên kurd li Libnanê bi cih bûbûn wek: hunermend Mehmud Ezîz, Sehîd Yûsif, Remezan Omerî û hunrmendên kurd yên jin jî li wir hebûn wek hunermenda hêja Şêrîn Perwer û Perwîn. Loma çûna Libnanê li xweşiya hunermendê me yî hêja Şêxo hat û di wirda gavin berfereh di hunerê de avêtin, du xol dersên muzîkê jî wergirtin, pêwendiyên balkêş bi hunermendên Libnanî re danîn wek Feyroz, Wedîh Safî, Nesrî Şemsdîn, Semîra Tewfîq û hin din.

M Şêxo û wan hunermendên Kurd li Libnanê bi hev re--komeke hunerî damizrandin bi navê Newroz û di pişt re jî koma Serketin, di wan komand gavin hunerî berfereh avêtin û bikar û bare xwe yî hunerî hunera Kurdî bi miltên biyanî dan nasîn. Bûn pişt ji Şoreşa Eylûnê re wext wext ahengên piştgiriyê ji Şoreşa Eylûnê re li dardixistin, bi stiranên netewî hestên gelê kurd dadigirtin.

Piştî rêkeftina 11.3.1970 ê de ya ku Kurdistana başûr pê otonomî wergirtî carek din wan hunermendên kurdên rojava piştvaniya otonomiyê kirin û komîteyek hunerî li Libnanê damezirandin ji wan nemir Mihemed Şêxo bû, Şêrîn perwer bû, Sehîd Yûsf bû, Mehmud Ezîz bû, Ezdîn Temo bû, Mihemed Teyb Tahêr bû, Rufetê Darî bû, Remezan Necim Omerê bû û carcar hunermendên din jî li gel wan beşdar dibûn wek: Dengbêjê Hêja Cemîl Horo. Wan Hunermendan aheng û fêstîvalên mezin li Libnanê li dar dixistin û piştgiriya otonomiya Başûr dikirin. Di sala 1972 ê de hunrermend Mihemed Şêxo vedigere Qamşlo û ji wir jî diçe Dêrikê di wê serdemê de Kurdê rojava bi coşekî mezin guhên xwe didan êzgeha dengê Kurdistan û êzgeha kurdî li Bexdadê û ew dibin serkaniya stiran û hunerê kurdî di deverê de. Loma hêviya her hunermendekî kurd bû ku stiranên xwe li êzgeh dengê Kurdistan û li êzgeha Bexa belavbibin.

Gav gelê kurd di wan êzgehan de guhdariya zimanê kurdî dikirin ku we pê hestdibûn Kurdistan azade, her kurdekî ji Kurdistana Rojava xaziyên xwe bi gelê kurd li Kurdistana başûr dihanîn û her kesî hêvîdikir ku li Kurdistana Başûr bijî.

Gava Hunermend Mihemed Şêxo dihat bajarokê Dêrîkê ser ava Diclê pê hestdibû ku bayê azadiyê li wî dide û li çiyayê Bêxêr dinêhêrî hesreta azadiyê dikşand û li wir ev stiran digot

**De were virde azadî şêrîn çav westiyan hîngî li te dinêrîn**

**Azadî Şêrîn herkes dinêrîn çav westiyan hîngî li te dinêrîn**

Ev helbest jî ya Adil Sêyfdîne Ew jî ji xelkê dêrikêye.

Birastî jî gelek kurdên rojava dihatin devera dêrîkê tenê ji bo ji dûrve li kurdistana azad binêrin sala 1993 ê em hin kes ji Efrînê çûn Dêrîkê tenê ji bo em ji dûr ve li kurdisatna azad binêrin em çûn gundê zixêtê dev mamoste Umerê Lalê ji me re got: Bimînin bi şevê, hingê kehreba zaxo vêdikeve kurdstana azad baştir tê xuyan. Ca navbera Efrîn û Dêrîkê ser 500 km re ye.

Mihemed Şêxo bi alikariya Partiya Dîmuqratî di sala 1973 ê hatiye kurdistana başûr li Behdînan hêzên pêşmergên qehreman bi dilgermî pêşwaziya wan kirine, eşqa dilê wî jî bi hêzkirine êdî destê wî ji Şoreşa Êlûne ya bi serotiya serokê netewa kurd Mel Mistefa nebûye. Ji Behdînan xwe berdaye navenda Şoreşê li ser xaka rizgarkirî dest bi xebata xwe hunerî kirî nemir Mele Mistefa û kurên wî yên leheng piştigiriya hunerê wî kirine, M Şêxo hingê bûye perçeyek ji Şoreşê ketiye nav pêşmergeyên ronakbîr û helbestvan û hunermend û di qonxek hunerî nuh de jîyayî, hunerê xwe jî bi hêz kirî dengê wî roj ji rojê belavtir bûye.Ev stiran jî belav kirî:

**Pêşmergên nebez dara azadî**

**Avdan bi xwînê bi şad û merdî**

**Silav her li wan li deşt û çîya**

**Xwîna xwe rêtin ji bo yî jîyan**

M Şêxo berê ku xwe lawê şoreşê didît êdî bi xwe bû şoreş bû şoreşger di hunerê xwe de û stiranên şoreşgerî dadihûnan û hestên netewî di nav milet û pêşmergan de bilind dikir û xebat bi gelê kurd xweş dikir bang li gelê kurd dikir ku li xwe û welatê xwe xudî bi derkevin û distrê- **... Dûmahîk Rûpel: 10**

## NÊÇÎRVANÊ HELBESTÊN DILDARIYA WELAT

**MIHEMED ŞÊXO ... Dûmahîk:**

**-Ev bû ye bîst û du sal li ser min ceng û bazî**

**Kurdo were min bixwaze belê bi servirazî**

Ji wir jî diçe Bexdadê hin stiranên xwe li Êzgeh kurdî ya Bexdayê tomar dike.

Pirtir navê wî belav dibe û cihê xwe koşka hunera kurdî de digre. Ji wir jî diçe dilê kurdistanê bajarê Kerkokê, li wir jî hin stranên xwe li TV ya kerkokê tomar dike, li seranserî bajarên Kurdistana rizgarkirî jî li ser hunermend û ronkbîrên Kurd, Turkman û Suryan geriya û sûda ji wan digirt û dikir xizmeta hunera xwe.

Ew ger û çalakiyên hunermend M Şêxo û piştgiriya Serokê netewî Mele Mistefa û kurên wî qehreman ji wî re bû piştek xurt ku baweriya xwe hunerê xwe xurt bibe û hunerê wî navûdeng bide.

Piştî ku ew serkirdayetî ya partî jî ji nêzîk ve dinase û qermaniya pêşmergan dibîne nikare Partî û kurdyatî, pêşmerge, şoreşgerî û rizgarî ji hev cuda bike û wisa stirayî:

**Li çil û şeşê xazgêncî hatin**

**Li şêşt û yekê berbûkî hatin**

**Ez bûm deriya xwîna Şehîda**

**Min gemiyek çêkir ji hestiyên Şehîda**

Pandora helbestên, stiranên M Şêxo li ser civaka Kurd pandora wê hunrmendî weke stêrek geş di ezmanê netwa kurda ronahî daye çawa hunermendê hêja Şivan Perwer nifşê salên heftiyan û heştiyan di sed sala borî de bi canekî şoreşgerî û berxwadanê bi berfirê xistin, Mihemed Şêxo jî nifşekî neteweperest û xemxarê rizgariya gelê Kurd û kurdistan bi ezman xistin. Loma du hunermendên kurdên rojava Rêzan û Cîhan di stirana xwe ya bi nav û deng de weha distiran:

**Du stêrk bi hevre li Kurdistanê hilhatin**

**Yek Şivan Perwere**

**Yek jî Şêxoyê girane**

Bê jimar xort û keçên kurdên xwendevan, dibin pandora stirana nemir M Şêxo de ketin nav rêxistinên kurdî û xudî li doza welat û gelê xwe bi derketine, di nav xebata netewî de mezin bûne.

Çawa miletê Ereb bi qewa sibê re divê guhadariya hunermenda xwe ya bi nav û deng Fîroz ê bikin, ji ber dengê wê yî narîn û xweş.

Piraniya gelê Kurd jî li rojava bi qehwa sibê re guhdariya hunrmendê xwe yî girian buha Mihemed Şêxo dikin ji ber hestrastiya peyvên stiranên wî yên netewî û evîna wî ya zalal ku ti carî nikarî bû, yara xwe û welatê xwe ji hev cuda bikirana. Ta niha ez hêvîdikim ku lêkolînek diyar bike ku yara wê hunermendî kinbû! Yan dirêj bû, qelew bû yan tenk bû, gewirbû yan esmer bû lê tev dizanin ku yara wî xebat bû welat bû, azadî û serfirazî bû wek:

**Kurdistana delalim her kes tê min dixwaze**

**Ez pir şoxo û şepalim min deng daye bi nazî**

Wî nemirî ta serê xwe daniye kurdistan li ser milê wî bû ye şoreş di nav dilê wî de bûye, ez dibêjim eger Kurdistan li wê dinyê jî hebe wê hîn jî li ser milên wî be.

Lê tenê rexneyek li ser nemir Mihemed Şêxo heye wek: Girîngî bi hunerê xwe daye Kurdistana başûr nedaye perçeyên din, raste li başûr tîna germiya şoreşê hebû wê tînê dabû sê perçeyên kurdistanê din jî, lê diviya perçeyên din jî di serguhên stiranên xwe re navêtana.

Li vir jî em dikarin nimûna stirana herî nazik bînin, stirana Gulê û şirofe bikin ku gul yare, yar jî ale, al jî berxwedan e, berxwdan jî, serxwebûn û azadiye. Gava distirê:

**Ay lê gulê gala min î**

**Şêrîna li ber dilê minî**

**Gulê nadim bi malê dinê**

**li ser gulê têm kuştinê**

Di vir de tê xuyakirin wek e her dildarekî ku li ser evînî û swda ya xwe salix bide û evîndara xwe wek e gulekê li ber dilê xwe bibîn e. Lê di vir de gava vê perçê stiranê dibêje:

**Gulê kesk û sor û ser**

**Nîşana alê li sere**

**Êdî reng sipî gewhere**

**Şêrîn û peymana min î**

Yekser yar di xeyala merov de dibe Al, al jî nîşana Azadiya miletane, hezkirina welat, yan evîna yarê bi walatê merov ve girê dide Lê gava di van bendê xarê de carek din dibêje.

**Xudê ez pismamê te me**

**Bi sûnd pesindarê te me**

**Ser ceng û hawrê te me**

**Qelenê te ji xwîna minî**

Çarek din jî xuya dike ku gul ne bi tenê yare yan welate, gul li vir êdî dibe şoreş, şoreş jî berxwedan û temendane.

**Ca ev helbest ya mamoste Umerê Lalê ye ji aliyê hunermend M Şêxo ve Hatiye stiran lê mixabin gava li Roj TV û Newro TV vê lê didin dikin helbest Cegerxwîn e, di vir de mafê xudiyê vê helbesta nazik tê xwarin.**

Mebesta me ew e ku dengbêjê me di hilbijartina helbestên stiranên xwe de, bi serkeftî bûye û taybetmendiya xwe di bîra gelê kurd cih girtî, wê yekê jî hiştiye ku hunermendê hêja di hunerê xwe de bi serkeve û bibe navdarekî kurd di dîroka hunera kurdî de.

Ji ber wê yekê M Şêxo bûye wek: Dibistanek hunerî, herçî guhderên wî hene kesin mebdeîne di evîna xwe de, di xebata xwe de, di rêxistina xwe de. Guhdarên huner û stiranên wî ne du rûyîn e, guhêzokî nênin, di hezkirin û xebata xwe de rastgone, pêl pêlî nînin, ji ber bercwandiyên xwe yên şexsî xwe ji partîyekî navêjin partiyekî din û zûzû xwe nafroşin.


Merov bi sanahî dikare guhdarên M Şêxo binerxîne, gava guhdarên hunerekî bên nerxandin, merov dikare wê hunerî wek: Mekteb bi nav bike.

Ez hunermend Mihemed Şêxo ne tenê bi huermend bi nav dikim ez dibêjim ew dibistanek hunera kurdperweriyê ye, bi nerîna min, ew dibistana yê her di nav rêzên dibistanên hunera kudî de bimîne û hunermend dikarin bibin şagirtê wê dibistanê .

**M Şêxo û Helbestvan**:

Mihemed Şêxo bi Helbestvanên stiranên xwe re rastgo bû tu carî bi helbestên helbestvana teserf nedikir. Eger pêwîst bi teserfê bikira jî divê destûr ji xudîyê helbestê bi girta. Di salên heftiyan de hêviya stiranbêjên kurd ew bû ku stiranên xwe li Êzgeha Bexdadê tomar bikirana. Lê gava derfet ji nemir Mihemed Şêxo re tê ku diçe Bexdadê hîngê helbestek ya- **... Dûmahîk Rûpel: 11**

## NÊÇÎRVANÊ HELBESTÊN DILDARIYA WELAT MIHEMED ŞÊXO ... Dûmahîk:



-helbestvanê hêja Sebrî Botanî bi navê; **Tu yî behêşta rengîn** kirye stiran û daxawaz dik e ku wê stiranê tomar bike, dezgeha Êzgeh hin mercan datîn ser wî ku bendekî ji wê stiranê biguhêrê yan jî jê bavêje M Şêxo mercê wan napejirîne, loma jî ji wî re wê stiranê tomar nakin, ew jî bê mint dibe û ji helwesta xwe danakeve.

*Serkanî ji Şexonameya perêz Beşîr botan-*

Rojekê jî me nebihîstiye ku helbestvanên stiranên wî giliyek li wî kirine.

Helbestvan û pevnivîsên stiranên wî gelek bûn ji wan: Cegerxwîn, Bêbuhar, Sebrî Botanî, Rêncber, Bedirxan Sindî, Xelefê Zîbarî, Enwer Mihemed Namî, Mistefa Etrûşî, Ehmed Şêx Salih, Fêdela Xiznewî, Mihemed Elî Şakir, Tiha Xelîl, Adil Sêyfdîn, dibe hinek din jî hebin em wan nenasin?

Piraniya van helbestvanan bi xwe helbestên xwe ji wî re dişandin.

Hunermendekî bê nefs bû tu carî xwe di ser miletê xwe re nedidît û tu carî nikarî dev ji xebatê berde gava şoreş hatiye rawestandin û pêşmergan rû li Îranê kirî, M Şêxo jî komek hunerî ji birîndarên şoreşê re damezirandî û dersên muzîkê dane.

Piştî vegeriye Kurdistana rojava bi wî temenî li Qamîşlokê komek hunerî ji zarokên Qmîşlo re damizrandî û bi xwe bûye rahênerê wê koma zarokan bê sûdekî madî.

Ez hêvîdikin ku hunerê nemir Mihemed Şêxo bibe subila stiran berxwedanê di rêbaza dibistanên kurdistanê de bê xwendin û peykerên wî li gulistên kurdistana azad bên venan, ta ku xizmeta hunermendê giranbuha li doza gelê xwe kirî, di bîra nifşên miletê Kurd de bimîne neyê ji bîrkirin . **( Dawî )**

## WALIYÊ 'SALA ŞEWATÊ' DURZIYÊ ŞAMÊ BÛ

**... Dûmahîk:**

'Îbrahîm Têlî yekî girê qirase bû. Eslê wî Durzî Şamê bû. Lêvên wî fena ereban qalind bûn, ji her lêvekî wî du çêlikê pişkan têr dixwrin... Nizanibû têrbûn çi ye... Yekî çavbirçî bû… Di hûrê wî de kurm an tîremar lîs bûbûn, sira bayê xelayê lê peyda bûbû an hucreyên têrbûnê yên di eywana mêjî de nizanibûn têrbûn çi ye... Serê gamêşekî di navoka wî de dihat veşartin. Zik nebû, defa Yasînê mirtib, şikefta lawiran bû. Mozinê mizgefta Pêxember jê re digotin: ´Zikniqre…´ Di niqre de meriv dims dikelîne… Meha gulanê ew û hin karmendên dewletê hatin Hezroyê mêvaniya Mîr. Walî tenê berxekî dagirtî fît avêt... Ji xwarina wî, em lalîgan men, me tilî xistin devê xwe. Çawa kesekî kare ewqas xwarinê bixwe. Ferqa wî û gayê cot, qoç bûn, ga bi qoç, ew kol, bê qoç, serserqot bû.'

Bi qewêtiyên Atatirk bûbû dostê zaruyên Sêvdîn Paşa. Kurên Sêvdîn Paşa, Xetîb, Baran û Receb, fena bavê xwe, dostên dewletê bûn. Di şexsê dewletê de jî, hevalên Îbrakîm Têlî bûn. Çeteyên wan bi eskeran re davêtin ser firaranên dijî dewletê. Ew firar dikirin semed, gund û gom talan dikirin. Gundî dikuştin. Agir davêtin xaniyan û derdiketin…

Sirguna gelekî kurdan, Walî ji ber xwe derxist… Xwedê nenas bû. Li Licê dostên wî, Xalibê Fatê, mala Mehmik û hin begên bejik bûn… Li Farqînê zaruyên destbirakê Atatirk Sadiq Beg û mezinê eşîra Xiyan Emerê Mihê jî di xizmeta wî de bûn. Mistefa begê Qabilcewazê ji Diyarbekir dernediket, misêwa bi Walî beg re qedehên mey dinoşandin.

Walî wisa zincîreke xefiyan honandibû ku kesî nikaribû bîna xwe bidaya û bistendaya... Kî ji kê nexweş buya, diçû ew gilî dikir… Yên tehda li wan dibû, ji bona xwe ji mexenetiya tometreşan biparêzin, wan jî ji bêçaretiyê yek ji nava bera xwe dişand û dikir sîxur. Êdî wisa bûbû ku di nava malan de jî sîxurên Mifetîşê Gelemperî, Îbrahîm Têlî hebûn…

Şêx Sigbetullahê mala Bokarik digot: 'Ji bona fitne û fesadiyê di nava kurdan de bi kar bînin, Atatirk û onbaşiyên dorê, yên Teraqîçî pirtûk nivisandine. Walî û onbaşiyên tên welatê me, ewil wî pirtûka fitne û fesadiyê ji ber dikin…'

Li Amedê giregir û mehqûlên bajarî yên xwenas dîl girtibûn… Yên şik ji wan hebû, giş di riyên sirgunan, penabiriyê de fetisandibûn... Dengê wan nedigihîşt ciyekê… Wisa di xafil de girtibûn, rebenan ketibûn derdê zik û zarûkên xwe. Li ciyê dûr û nenas nikaribûn êrxatî jî peyda bikin.

Fena çêlikên kewmariya gulanê ji hev bela bûbûn. Bav avêtibûn Deryareş, law avêtibûn Deryaspî, birazî dabûn Teraqyayê. Deng ji wan dernediketin... Yan jî destê hinekan li ser devê wan bû… Ji rêçûnê, qulbûna binê solan zekemî, arsimî bûbûn… Diravê dermanan jî di berîkên wan de tune bûn. Bi wan re têkilî danîn qedexe bû... Kesî nizanibû ew beg, şêx û giregir li ku, kîja walatî, wîlayetî an qezayî de ne. Di aliyekê de, ji vanên dîlmayî xogî dixwar, bi hesyet û namûsa wan dilîst, ew piçûk dikirin, di aliyê din de tirseke bêqiyas dixistin cerg û hinav wan. Bi bêbextî, tewirên cûre bi wan dilîstin... Kes newêrî bibêje tix… Fena mirîşka meriv serê wê têxe binê bask wê, bêdeng mabûn…

Kesê dijî polîtîqaya Walî Beg derketa, ya di jêrzemîna qereqolan, di binê dar de can dida an jî di nava kuçeyekê de ji para guleyek di şatika stû an kortikê de çik dibû û jinên wan jinebî, zarûk sêwî diman. Walî Beg ne tenê bela, bobelat, nexweşiya kotîbûnê bû... Ji tirsa wî, yên fama kapsorî dibûn…

Îbrahîm Têlî, şevê bi qîzekê, bûkekê re kayina xwe danîn... Hesyet û namûsa amediyan di binê potînên dewleta Onbaşiyan de bûbû şakîlê payizê, yê binê daran, yê rizyayî. Şeva Walî li garnîzona Qolordiya Heftan de qîzên amedî nedana reqsê, xewa wî nedihat… Di mala mele û Şêxên kurdan de, defter û pirtûk nehîştibûn... Quran û Encîl jî bi pirtûkên din re dibirin, di tenûrên garnîzonê de dişewitandin. Ne tenê pirtûk, nameyek, rêzekî nivisandî di malê feqî û seydayên kurdan de nehîştibûn...

Bangî axa, mehqûl, gigerir û keyayên gundî dikir dibirin qerargaha xwe û Mirsel Paşa, heke wan kesan jê re kîsikekî dagirtî xogî bi xwe re nebira, agir li cinan, ecniyan, kevir û kuç li wan kesan dibariyan... Hêlikên wan dikirin nava darikan, textikan, dixesandin û nemêr para dişandin cem jinên wan. Yên dorê ev dibihîst, zende li yên mayî diket…

Hesen Axayê Cebariyê digot: 'Îbrahîm Têlî ji etekê Qerejdaxê bangî serek eşîerê bêrtiyan Kamil Axa kir, -xinamiyê me bû - bir Diyarbekir. Rebeno hay lê nebuye, nizanibuye, ji Walî û Paşa re zêr û pere bi xwe re nebirine… Qederekî di jêrzemînan de hîştin, xesandin û para şandin gund. Kamil axa di ser çilsalî re, çar jinên wî... Piştî wê xesandinê, çend meh paşê ew kawisê mêran har bû, ewil bi şeşderbê her çar jinên xwe û dûre jî xwe kuşt...'

# HILBIJARTININE JI HELBESTÊN ÇÎNÎ



Wergerandin ji 'Erebî:
Fadil Temo
fadiltemo@hotmail.com
( Kobanî - Sûriya )

## ŞEVBUHÊRKA DOSTINE

**Lî Biyî**
(701 - 762 Z)

Ji bo ku tu
Xemên xwe yên kevnar bişoyî
Gereke ku tu
Hezar kûzî vexwî
Êvarbuhêrkên zelal
Hatin Peydakirin
Ji gotinên zelal re
Û heyva spî gereke ku
Qedexe bike xewa çavên me
Serxweş emê razin
Di çîyayê vala de
Ezman û erd
Mitêl û balîfa me ne.

## EZ BI TENÊ VWDIXWIM DI BIN TAVA HEYVÊ DE

Di nav çîçekan de
Kûzek mey heye
Bi tenê vedixwim bê heval
Peyala xwe rakir û
Min heyv vexwend
Va em bûn sisê:
Ez û heyvê û siya min.
Tevî ku heyv
Nizane çawa vexwe
Tevî ku siya min
Nizane ji pêvî bi pê min keve
Min ew kirin hevnoş di
Kêlîkeke tek de.
Ta ku şahiya te bibe
Pêwîste ku tu
Biharê bigrî.
Min stra ta ku
Heyv li ba ket,
Ez rabûm dansê ta ku
Siya min li ba ket,
Em
Berî ku ez serxweş bibim
Giş dilşa dibûn.
Ku ez serxweş bûm
Em ji hev bela bûn
Wasa bû pêwendiya min
Bi ev her du dostên sert re,
Hînga ku heyv
Li bendê min dima
Di kunbeta ezmên de.

## STRANA (( LIYANC ŞO ))

**Wanc Han**
(sedsala Hejdeya)

Mey çêj xweş e,
Ya peyala wê
Çirisînek heye di şevê de
Ez dixwazim ku
Berdewam bikim vexwarinê
Lê reşbigîr
Min vedixwînî
Siwarbûna hespê min
Ezê di meydana şer de
Serxweş razim
Ji min re bêjin: çende hejmara
Ew kesên ji şer vegeriyane?

## XUNAV LI SER ÇÎÇEKAN

**Helbestvanekî Nenas**

Ax ! Ey xunava li ser çîçekan.
Çi zû tu zuwa dibî!
Tu dê siba
Careke nû peyda bibiye.
Lê dê kengî vegere
Ew mirovê ku dimire?

## DILSOZIYEK

**Şanc Tsî**
( Sedsala Neha)

Tu dizanî ku ez
Ya xeynî te me
Û tevî wê
Tu du gewherine çirisîndar
Diyariyî min dikî,
Hejandim ez
Evîna te ya daçikyayî
Min pê şîrîn kir
Kincê xwe yê hevrîşmî sor
Mala min bilind e,
Hevsiyayetiya mala êmpirator dike,
Mêrê min
Rimê radike di ((Qunaxa Ronahiyê )) de
Mebestên te
Di zelaliya roj û heyvê de ne
Lê min sond xwariye
Ku ez
Xizmetiya mêrê xwe bikim
Her du gewherên te
Li te vedigerînim
Û du hêsr di çavên min de ne.
Çira min tu nas nekirî
Hînga ku ez keçikek bûm.

## DARA DARÇÎNÊ DI BIHARÊ DE ( Hevpeyvînek )

**Wanc Tsî**
( ??? - 644 Z )

Min ji dara Darçînê re
Di biharê de got:
- Darên Şivtelihê û Xoxê çîçek dane,
Bihar her derekê dadigire,
Çi bi te hatiye tu çîçek nadiye?
Dara Darçînê bersiva da min:
- Çîçekên biharê berdewam nakin
Siba dê bahoz wan berba bike û
Qeşa wan xwar bike
Û wê hîngê
Ez tenê çîçek didim.

## JI MÊRÊ WÊ RE

**Şan Yo Lan**

Mêrê min
Zêrevaniya sînor dike,
Û ez li welatên (( Wew )) rûniştîme
Bayê rojava tê ,
Xemên min şiyar dike.
Xêzek ji peyvan, û
Hezar xêz ji hêsran
Serma nêzik bû,
Ma kincên zivistanê
Gihiştin te?

## KEÇEKE MEXOLIYE PANZDE SALÎ

**Şanc Hisyan**
( Sedsala Çardeya )

Ez
Keçeke Mexoliye
Temen panzde salî nas dikim
Ew weku guleke vebûyî ye .
Li ku dibe ku tu
Wê bibînî?
Di meyxaneya (( Banc Şo Wo )) de
Rûyê wê
Şewq dide,
Weku ew
Rojek ji rojên biharê ye.
Birûyên wê kişandîne,
Ya wan zîvirandina çîyayên dûr heye,
Lê wê
Hemberî girnijîneke
Xwe siparte min.
De çira
Xwe vedişêre
Di paş baweşînka wê ya hevrîşmî de?

## YEKEMÎN SERŞÛŞTIN JI KURÊ MIN RE

**So Tanc Bo**
( 1036 - 1101 Z )

Her yek ji me
Xwezî dike ku
Kurekî wî yî zîrek hebe,
Û tevî wê
Zîrekiyê jiyana min wenda kir,
Ez dixwazim ku
Kurekî min yî nezan û hov hebe,
Ta bê êşkêşan
Bibe wezîrek

## STRANEK

**Şanc Kan**
( Sedsala Şanzdeya )

Min ji yarê xwe re got:
- Dereng nemêne di vegera xwe de îsal.
Heke giyayê peravê kesk bû di biharê de.
Dişike dilê min.

## QIRAK RADIHIJIN LIBAN

**Şa Şin Hisanc**
( Sedsala Hejdeya )

Ji pê re,
Çêlek kîsin dikşîne,
Û serê wê li jore,
Ji pa re,
Qirark radihijin liban,
Û serên wan li jêrin,
Çêlik erdê cot nake ji bo qirarkan,
Û qirark bi xêra çêlekê dixwin,
Cotkarê ku çêlekê êm dike
Birçîtiyê dikşîne,
Ew kêmtir kêfxweşiye
Ji qirarkên qelew
Yên ku difirin li her derekê.

## STRANA SIBA

**Şiyan Ho Tan**
( Sedsala Hejdeya )

Siba pêre siba,
Çi pirin rojên sibakê!
Dirêjahiya temenê min
Ez bendewarê siba me .
Û naqede siba.
Siba me
Me gêre bêhêviyê ji roja me dike.
Em pîr dibin,
Di demê ku dahrin
demsalên biharê û
Diçin demsalên payîzê.
Sibehê em avê dibînin
Ber bi rojhilat de diçe.
Êvarê em rojê dibînin
Li rojava diçe xwar.
Çend siba
Di sed salî de ne?!
Guhdar bikin ji min
Strana siba.

** Ev helbest ji zimanê Firensî hatine wergeranidin bo yê Erebî, û min jî Ew ji Erebî wergerandin .*

## KARÎKATUR




**Rêber Kalo**
*reberkaloo@hotmail.com*
( Kobanî - Sûriya )




## JI GORISTANAN

### GORA

## Baba Tahir ê Lurî

### LI BAJARÊ HEMEDANÊ

**( Sedsala 11 an )**



**G**ora Baba Tahir ê Lurî ( ji sedsal a 11an?? ) li Hemedanê - Îranê ye. Baba Tahir navdare bi Baba Tahir ê Uryan (Tazî). Yekemîn Helbestvanê mezin yê kurd û Farisî-nivîs e. Êzingvanekî nexwendî bû tev li xwendevanên mizgeftekê bû û rêya derwêşiyê girt.

## KUŞTÎ



**Murat Yapiştiran**
( Stenbol - Turkiya )

**K**uştiyê çavên te me
Ne yên dil
Deriyê çavên xwe li min veke
Da ez werim xwe tê de bikujim
Ji bo dilê te şîna min
N e g e r î n e
* * * * *
Razaye sazê dil
Ji zû ve
Û gotinê tu pê qayil ne dibû
Bû stran
Di nav lêvên miçiqandina hunerê de
Diherike deşta helbestan
Gola tijî evîn
Da ruh bide dilê şikestî
Bicebirîne
Ku êdî neşkê

## XATIR

Berî hemû tiştî
Çavên te xatir xwestin
Çavên min li ber girî
Dûv re
Du gotin zîzikîn
Ser lêvên qermiçî
Û paşê
Stranên bi navê te xemilandî
Weşiyan erdê
Binax bûn
Bê dengiya por li xwe ba da
Û em bûn xwediyê du dilên mirî

## TABLOYÊN DOSTANIYÊ




**Xada Siwêd***
*ghada-swied@hotmail.com*
( Şam - Sûriya )




* **H**unermenda wênekêş ya 'ereb Xada Se'îd Siwêd li welatê Sûriyê; bajarê Şamê di sala 1967 an de ji dayik bûye, ew ji bavê xwe de Filestînî ye û ji dayika xwe de Sûrî ye, xwendina xwe ya bilind di perwerdeyê de li zanîngeha Meimûn li bajarê Şamê qedandiye.

Xada jiyana xwe ji sala 1970 î ta 2001 an li welatê Îmarat ê; bajarê Dubey domandiye, di sala 2001 an de li gel romanivîs û sînaristê telefizyonî yê Filestînî û navdar Hesen Samî Yûsif zewiciye û jiyana xwe li bajarê Şamê; Sûriyê didomîne.

Xada hêvî dike ku di riya tabloyên xwe re dostaniya gelê kurd bike; têkliyeke rewşenbîrî bi rojnamegeriya kurdî re ava bike; her weha çanda kurdî nas bike.

# ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

**Roman - Xelek ( 7 ) ©**

**Pîr RUSTEM**

*pir1963@gmail.com*

( 'Efrîn - Sûriya )



- Hûn kengî kerem dikin ser çavan, tu jî û bavê Şêrînê jî. Mîna ku, wê navê xwe bîstibe, bi gotinê re dikeve hundir. Rahiştina tepisiya xwerinê hêştiye ew duta bibe û gava ku, Koçer wê wilo dibîne, hêzekê dide xwe ku, rabe û tepisiyê ji dest wê bigire, lê bi çav lihevhatina wî û yê ku, ji berî wî rûniştibû, dihêle ew di cîde sar bibe û ew dixweze wê rabûna ser xwe, bi boneya ku, wî dixwest cihê xwe xweş bike, veşêre. Lê di dema ku, Şêrîn nirînekê li wî dibarîne, tu dibêjî belkî sed hesp di dilê wî de bezîn û ew tê derdixe ku, bizava wî beravêtî bû.

- Ka dêw jî, ji me re, bînin. Xwesteka bavê Şêrînê, bi hawarî wî tê û wî ji wê tengiyê bi derdixe û hîne keçik ji odê derneketibû, diya wê dikeve hundir û piştî ku, zerka dêw datîne ser sifrê, ew tê û silavekê li Koçer dike; “De kerem kin, we îro em ji nêza re kuştin”. Koçer bala xwe dide bavê Şêrînê ku, ew ne li gor danasîna keçikê jê re ye; ew tersî tiştê ku, wê li ser digote, yekî dilvekirî û rû li kene. Dihêle yên dora wî, di kêlîka pêşî de, rihetiya xwe bistînin û weke dostekî kevin bi wî re bidin û bistînin.

Rûniştin bê yekî wekî wî, dê xav be. Erê û belkî laşê wî yê gir û ew simbêlên ku, dev û lêvên wî veşartine, dihêlin tu hinekî bi tirs û dilgirtî bi wî re bide û bistîne.

Lê piştî rûniştineke kurt, dê bihêle ew gûmanên te vemirin û ew cihekî fireh, di dilê te de, bigre.

- Tu hertim wilo xwe ji bîra dikî. Reşîtê Horo ji nişkava dipirse û bi bihîstin û dîtina ku, ew li benda wî sekinîne, da ku bi pêş ve bê û nanê xwe bixun, çilpikên xwêdanê di eniya wî de dipişkuvin.

- Bi borînin. Koçer bi fedî dibêje û cobarên xwêdanê diherikin.

- Tu pir li min dinêrî, weke ku te ez bi kesekî nimûnandime. Bavê Şêrînê ji wî dipirse.

- Belê; Bavê min pir nêzîkî te bû. Koçer bi ken dibêjêyê û xelekeke din ji yên valahiyê di mejiyê wî de derdikeve û ew, heya ewê hîngê, xwe ber ve xwerinê dide. Lê gava dibîne ku, ji bilî wan hersiyan ti kesî din ber ve xwarinê nehat, ew bi nirîneke bi pirs, li dora xwe dinêre û dihêle xwediyê malê bersiva nirîna wî bide.

- Ewê paşê bixun. Bi gotinê re jî dêng li keça xwe dike ku, kasêtekî deynê ser tomargeha ku, di devê pencerê de danîbûn. Bi derbasbûna wê re, Koçer bala xwe didêyê ku, wê cilên xwe bi hineke nuh guhartine.

Bihna wî li ser xwarinê teng dibû û nemaze di cihên teng de û di nav kesine biyan de, lewre ew ji xwestina kasêtê re pir dilşa bû û bi nêrîneke sipasî ber bi bavê Şêrînê dinêre. Ev tirs û diltengiya ku, bi Koçer re, li ser xwarinê çê dibû, damarên wê vedigerin zaroktiya wî; di demên ku, li ser xwarinê rûdinişt û dibû çep-lepa diran û devê bavê wî, ew pê hest dibû ku, piçekî din dê wî jî bavêje nav diranên xwe û bihêre û pir şevan ev xewn didît ku, devê bavê wî aşekî mezine û ew jî mîna pariyekî di nav diranan de tête hêrandin.

Weke ku, bavê Şêrînê ramanên wî bixwîne, wî heya bi dawiya xwarinê axaftina xwe ranewestand û pir caran jî ji qazî ve-xwarin bi ser sifrê û xwe de dirjand, hêşt çêroka kalemêrê pir ji xwe razî û tentelîz, bête bîra Koçer; ku çawa ewî di mala xwe de û di rûniştineke weke evê de, bi mêvanekî xwe re, dihêşt tirşik an jî savar ji sênîka ku, jê dixwar û heya bi nav rihên wî, rêçikekê bajo, da ku, mêvanê wî, tiştek rijand, fedî neke. Erê ewî tiştî pêwîst ne digot û heya ku, gotibe jî, bala Koçer ne lê bû, lê ev karê wî cihê comerdiya wî bilind dikir û hêşt ku, Koçer bêtir rûmetiya wî bigre.

Rûniştina Şêrînê, di hemberî wî de, hêştibû ku guhên Koçer, tenê, li ser hundirê wî vebin û her ku çav ber bi yên wê hildidan û yên wê jî direvîn cihekî dîtir, tîna dilê Koçer bilintir dibû û kirîzeke tûj di gewdê wî re diherikî.

Piştî xwerina şîvê û danîna piyalên çayê ber wan û derketina Şêrînê ji odê, Koçer hinek aramî vedigerîne û ew dixweze ji ewê neyîniya ku, ji dema hêz dabû xwe de, da ku sifrê ji dest Şêrînê bigire, rizgar bibe û ji berî ku deng bi wî keve, cigareyekê dikşîne û ber bi Reşîtê Horo dizîvire û dipirse.

- Te negot; tu ji kuve min nasdikî.

- Çavdêrên wî pirin. Bavê Şêrînê bi ken vedigerîne.

- Ji vir û pê ve divê yek bi hesab gavên xwe bavêje û hinekî bi tirs pê re bide û bistîne. Koçer jî bi henekî dikeve nav axaftinê, tevî ku dema wî xwestibû deriyê axaftinan veke, neket ser bala wî ewê di evî derî re derbasî guftûgoyê bibe, lê di rûniştinên bi yekî weke bavê Şêrînê re, dive yek hesabê her tiştî bike.

- Bavê Şêrînê henekan dike. Mamoste, yên ku te nas dikin pirin; ew karêd te digel komên hunerê, hêştî herkes te nas bike. Tevî evan gotinên wî jî, lê tenê çend roj bûbûn ku, hevalan Koçer bi wî dabûn naskirin û hinekî jê re li ser axivîbûn û wê yekê hêştibû ku, ew bixweze wî binase, piştî sê mehan ji rûniştina bi hev re.

- sipas ji pesnên te re, bes min ti kar nekirî heya ku, ez evqasî navdarbim, da ku bihêle tu hertiştî li ser min zanibî.

- Ez dibêjim dê ne tiştekî baş be ku, mirov hertim bi çavekî biçûk li xwe binire. Reşît I. vedigerîne û dêst davêje çaydên, da ku, piyala dudiyê dagire û piştî ku, firekê jê dibe gotina xwe dajo serî: lê ev nesaxî, ne ya te bi tenê ye, ew bûye nesaxiyeke sincî ji miletê me re û partiyên me jî bê zanîn, di evê çêrokê de, roleke neyînî lîstine; heya gihêştiye ewê pileya ku, miletê me xwe li vir tuneyî bibîne û eger ku, em hinekî dilgerm bin, emê bibêjin ku, ewana hêştiye ev milet xwe weke dûvik ji rêjîman û perçeyên din re bibînin.

- Bes rola Kurdên me, yên perçên din, ji bîra neke ku ew jî û heya ji wan tê, dixwezin em peyên wan bin. Û di gel pir sedemên dîtir; çi ji surûşta herêman û evan hersê bêrîkên ji hev birî; ango heya ev hersê herêmên ku, bi para Sûriyê ketine jî, bi pir tiştan ji hev dûrin. Û tiştê din ku hêştî. Koçer ne dikarî ewan ramanên ku, di mejiyê wî de derdibûn, bi rengekî hişmendî bîne zimên û wan bi hev ve girêde.

- Bibore û peyva xwe ji bîra neke û ji berî ku, tu sedemên din jî dibêjî, ez dixwezim bipirsim: ka em û yên Cizîrê yan jî yên Kobanê bi çi ne weke hevin. Reşît gotina wî dibire û jê dipirse, dihêle Koçer bi bihntengî vegerîne û bersiva wî bide.

- Bi pir tiştan; ji zaravên ku, em tînin zimên de bigire, heya bi xwarinên me ne wek hevin, rabûn û rûniştinên me. Bi yek gotinê sinciyên min û yekî Cizîrê li hev nayên.

- Ez dibêjim; tu hinekî bi hestê kesê hinermend li ber babetê rawestiya ye û ne bi nirîneke mejiyê zanyariyê. Tu çi dibêjî bavê Şêrînê?.

- Ez ji wan re venahesim, ew xwe di ser yekî re dibînin. Em çiqasî rûmeta wan digrin, - ... Dûmahîk Rûpel: 15

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-ew ewqasî me biçûk dibînin. Gotinên wî nişkabûnekê dixe ber wan û Koçer dixweze gotinên wî bidoşe.

- Te bihîst; nirîna aşkere û açiq eve. Ne bes ji aliyê gundiyan ve, heya bighe xwendevanan jî ev nirîn e û herdu alî jî wilo li hev dinirin. Ez nizanim te dîtî yan na, eger ku di civakekê de çend kes rûniştibin û her çendek ji herêmekê bin, tu dibînî ku ew xwe didin nik hev û di lêqirdiyên xwe de dixwezin yên din tineyî bikin. Koçer, bi dawiyê gotinê re, pozê xwe bilind dike, weke ku wî qonaxek ji şêr bi dest xwe ve anîbe û têde serketî derketibe, nemaze piştî ku zanî nirîna bavê Şêrînê jî weke ya wî ye.

- Evqas salin ez karê konevaniyê dikim û çi di demên ku, ez endamekî Partiya Komonîst bûm an jî nuha û di gel evqas hevalên me jî hene, çi li Cizîrê yan jî Kobaniyê, me ev tişt nedîtiye. Koçer berkenî dibe û lê vedigerîne.

- Raste; di demên ku, ez hevalekî Hevgirtina Gel bûm, min jî nedidît. Lê di roja îro de ez dibînim, tu dizanî çima?. Ji ber ew perda ku, avêtibûn ber çavêd me, îro çiriyaye. Koçer bersiva xwe bi xwe dide.

- Tu di mafê polîtîkê de gunehkariyê dikî û gotina te li ser her partiyekê nayê pejirandin û ne jî di cî de ye, gereke tu wan tevan di zikhev de neşewtînî û tiştê din, weke ku ez zanim, pir dostên te di Cizîrê de jî hene.

- Xûyaye min nikarîbû nirîna xwe, bi te, bida naskirin. Demê ku ez dibêjim; cudayî di navbera her herêmekê û ya din de heye, merem jê ne ewe ku, em dijîtiyê di navbera wan de derînin meydanê. Lê dive em, vê cudahiya heye, ji bîr nekin, tevî ku em dizanin jî, ev yeka ji encama konevaniya ku, li ser miletê me, tête ajotin e. Û helbet ev cudayiya, ji ya ku, dihêle jiyana me ya çandî û ramyarî zengîn bibe, cihêye û gereke em wan ji hevdu derînin, da ku, em karibin şerê ewa pêşî bikin û ya din jî geş bikin.

Gereke em, di bin evê nerînê de, bilivin; em ne newekheviyên erênî veşêrin û ne jî yên neyînî. Lê mixabin em bûne du par, hinek ketine şerekî herêmî, rew-rewkî û her tiştî reş davêjin ser herêma dîtir û bê zanîn raja konevaniya dewletê dikin û para dîtir jî her tiştî sipî dibîne û dibêje; Ti cudayî di navbera herêman de tineye û bi dîtina min ew jî raja ewê konevaniyê dikin.

- Ez wilo bi nirînên te re me, lê tevî ewê yekê jî, ez dibêjim; eger ku çiqas cudayî di navbera me de hebe jî, hêvî û girêdanên me, yên ku, me ji hevdu ve nêzîk dikin, ji ewan cudayiya bêtirin û divê em bi çavtengî li hevdu nenirin.

- Mixabin, di roja îro de, ev tişt çêbûye. Xasma di nav xwendevanan de û di nirînên min de; xortên Cizîrê di ber evê yekê de, bêtir, gunehkarin. Koçer li Reşît vedigerîne.

- Ez dibêjim; te zêdetirî mafê çêrokê dayiyê. Reşîtê. Horo dibêje wî û Koçer di zarava wî re tê derdixe ku, ew dixweze babetê buguhêre. Lê mina ku, cinek li Koçer siwar bûbê, ew bêtir mijarê fireh û kûr dike.

- Na, eger ku, tu di roja îro de derbasî hundir zanîngeha bajêr bibî, tu yê evan tiştan bi rengekî berz bibînî. Wê rojê min bihîst ku; xortin Efrînê gihêştine helwestekê ku, ew komele yan jî partiyekê damezirînin, da ku, li hember xortên Cizîrê û derbasbûna wan, nav civaka Efrînê, rawestin.

- Ev tiştine bivene û eger ku, bêtir belav bibin, dê dijberiyekê derînin holê, eger em nebêjin dijmantiyekê û xwesteka dijmin jî eve ku, me ji hundir ve biherfînin; çi bi dijîtiya êlî, partî û nuha jî, weke ku tu dibêjî; eva herêmî. Bes, di dîtina te de, dê sedemên evê yekê çibin.

- Belkî sedem pirbin, lê û di nirîna min de, yek sedem roleke mezin dilîze û li piş sedemên din jî radiweste.

- Tu nabêjî ka ew sedem çiye. Bavê Şêrînê heya ewê demê bêdeng mabû û ewî guhdariya wan dikir, lê gava ku, -

-Koçer ewê gotinê dike ew xwe nagire û dixweze bi lez ewan sedeman nas bike, lew re ew bi dilekî germ di pirse û radihêje pakêtê, da ku, cigaran li mêvanên xwe belav bike.

- Yek dikare bibêje ku, nesaxî di me de ye; lê ev yeka ne berhema roj û şevekê ye û Kurdên Cizîrê, evê nesxiya me didoşin; em ên Efrînê hertim xwe kêmtirî wan dibînin û ji ber ku, em giş di derûna xwe de bi evê yekê hest dibin û li keysekê digerin, da ku, girêk û aloziyên xwe tê re derînin, em ji bilî hevdu, ti kesî ji xwe qelstir nabînin, da ku, evê yeka xwe çareser bikin.

Û bi evê awayî, Kurdên me yên Cizîrê ji bilî Efrîniyan li pêşiya xwe nabînin û em jî evê yekê di seriyê perîşanên Kobaniyê re dertînin. Û çêrok gihêştî pileya ku, xortên Efrînê gotinên kêm li ser keçikên herêma xwe belav bikin, tene ji ber ku, têkiliya hin keçikên me bi xortên wan re hene; pir caran li guhê min ketî ku, ji hev re dibêjin; "Law eger gi ti dixwezê qîzkik me Êfrîn bi dû te kevê û tu wê hûnê ser şeyî xwe, li şûnê tu vê re dibê; ti çoyî, vê re bibê; tu çawayî û tu ji xwe re bibîn gi ew ço didê dû te". Gotinên Koçer dihêlin Reşît bi dilekî şikestî lê binire; ewî hêviya nîrîn û dîtineke hişmendî jê dikir ku, ew destê xwe deyne ser birînê û bide xûyan ku, dijmin heya kîjan pileyê kariye me ji hevdu bi dûr bixe û bihêle em şerê hevdu bikin û ewî jî ji bîr bikin.

- Bi Xwedê, gotin zêre. Ez hertim dibêjim ku, evên Cizîrê dixwezin weke axayên berê bijîn; eger ku, ti tişt bi wan nema be jî gereke ew temîz bin, hertim cilên wan paqij û kewî kirî bin û eger ku, ji bilî sed diravî wan tune be jî, ew bi pêncî pakêteke Malboro dikirin û bi pênciyê din jî qehweyekê veduxun. Ew û Qermîliqan weke hevin; berîka wan valaye û cilên wan ên begane. Bavê Şêrînê, careke din, gotina wan dibire.

- Nuha ev nesaxî, hêdî-hêdî, damarên xwe berdide nav endamên hinek partiyên me jî û ew dipirsin; dê çima, hertim, sikritêrên partiyên me ji Cizîrê bin. Helbet rola van partiyan, bi xwe jî, di evê çêrokê de heye. Her ku diçe, Koçer çêrokê firehtir dike.

- Tu li ser çi bingehê evê nirînê didî. Reşît dipirse.

- Weke ku, min berê jî got; ew gihêştî pileya ku, heya hevalên komikekê jî li hevdu nakin, yên Cizîrê li xwe dinirin ku, ew ên pêşengin û herdu herêmin din hertim ên rêza dudiyane.

- Ka neyîniya partiyan di evê yekê de çiye. Heya bi ewê hîngê, Şêrîn tevî bihna qehwê dikeve hundir û dema ber bi Koçer dinire, riwê kesekî dîtir di wî de dibîne; ew rûdêmên wî yên tenik, xwe bi eyarekî guran, gihartiye û du çavên sor, di seriyê wî de, dibrûsin. Ew ji evê gihartina wî ditirse û bi nîv bazdan ji hundir dredikeve, pir raman û wêneyên reş êrîşî wê dikin. Lê kenê bavê wê, hinekî, dilê wê dide rûniştin.

- Nesaxiyên civakî dê, sedî-sed, derbasî nav partiyan jî bibin û ev endamên wan, ne ji cîhaneke din ji me re hatine, ew jî Kurdên me ne, bi girêk û nesaxiyên xwe ve hatine nav partiyan.

- Bes, ev kesin e bijartî ne û gereke zana bin jî. Bi ser de jî ji partî tê xwestin ku, hevalên xwe ji nirîn û sincên civaka kevneşop bi dûrxe.

- Di nerîna min de ev hişyariya ji me tevan tête xwestin û ew ne tenê rola partiyaye, tiştê din tu girdekî mezin dide mijarê. Reşît dibêje û ber bi bavê Şêrînê dinêre, belkî karibe piştgiriya wî bistîne. Lê ew ketibû bin akama Koçer û newêrîbû bê erêkirina wî ti gavan bavêje, lewre ew mîna pûtekî bê deng dimîne.

- Tenê di aliyê nirîn û dîtinan de, raste. Lê di aliyê kar û baran de, partiyên me nimûnene, jîndar û rastwqînin, ji civaka Kurd re. Ewana gavek jî bi pêş civaka xwe navêtiye û pir caran bêyî ku, zanibin çidikin, ew dikevin raja hêzên kevneşop û yek dikare hinek nimûneyan jî bîne zimên,-... **Dûmahîk Rûpel: 16**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-da ku, nirîna yekî hinekî zelal û sayî bibe.

- Weke çi. Bavê Şêrînê dipirse. Wî guhdariya wan dikir û da ku, xwe kêmtirî wan nebîne, ewî her çendekî gotineke kurt davête nav wan, an jî deng li Şêrînê dikir, da ku, tiştekî jê bixweze û mêraniya xwe beloq bike û di vir de jî dêng li wê dike ku, ew piyleke din a avê ji wan re bîne. Lê hîne gotin di devê wî de bû, keçik dikeve hundir û bi dest wê de şerbikekî avêye.

Bi hatina wê re dilê Koçer tête guvaştin, lê ew xwe digre û ji çavên Şêrînê direve mijara ku, ew têde gêj bûbûn.

- Pir tişt hene ku, yek dikare li ser raweste; nimûne, têkiliya evînî di navbera keç û xortên me de. Ji aliyekî ve, weke ku me dîtî xortên me li dijî têkiliyên keçikên Efrînê û xortên Cizîrê radiwestin û ji aliyê din ve jî yek dibêje; belkî ti meraqa wan xortan, ji bilî ku keçikan ji rê bêxin, nemaye.

Tevî ku em dizanin, ev çêrok, di civaka me de, bi xwînê tête şûştin. Lê tevî wê jî xortên me wan çêrokan aşkere dikin, da ku, karibin rê li ber xortên Cizîrê bigrin, eger ku bi xwînê be jî, ne xema wan e û di vir de jî, careke din, partiyên me bi roleke neyînî radibin; li suna ku, ew cêrokê bi tepisînin, tu dinirî ewê herdiwan ji partî bi dûrxînin û navê wan di “Kutikê Istenbûl” ê re derînin û ji bo çi; ev giş, ji bo gûmanên wan ku, têkiliyeke evînî di navbera keç û xortekî de heye.

Koçer xwest bibêje; eger ku, bibhîsin hevalekî wan ramûsanek ji keçekê sitandiye. Lê tirsiya ku, ramûsana ji berî demekê ku, ji Şêrînê biribû, bihin bide. Di dawiyê de Koçer, ji wan, dipirse: ka ev ton sinc ji ku hatiye û gûmanên xwe datîne ku, ew ji bihneke olî û lahotî dikşe. Tevî ku, bavê Şêrînê tênagihe ew çi dibêje, lê li xwe danîne ku, li ser bête gotin; ew yekî nezane, lewra jî ew seriyê xwe, ji dîtinên Koçer re, dihejîne.

- Bes ne hertim û ne her partiyek wilo li ser çêrokên civakî radize û bibore, ev çêrokên di navbera keç û xortan de ne ti meseleye ku, tu bikî xalek li ser partiyan, çareserkirina wan dem jê re dive. Reşîtê Horo têdighe ku, çêrok ne hezkirin an ne hezkirine, nirînên wî ji ewê yekê kûrtir û firehtirin, lê ewî ji tirsa civakê û da ku, endametiya xwe bi carekê re winda neke, wî nirîn û dîtinên xwe bi rengekî pêçayî tanîn zimên. Heya ew dighe ewê pileya ku, ew bi xwe jî, nikaribe ji raman û xwestekên xwe fêmbike.

Lewra wî xwest Koçer ber bi kaniyê ve bikşîne û bihêle ew hundirê xwe hilweşîne û ji bo ewê yekê, evê pirsê datîne ber wî; “ka tu vê yekê çawa dibînî ku, roja îro keça Kurd ne bes ji xwaringehê bi derketî, lê ew derketiye ser çiyan û mil bi milên xortan ve, ew ketiye nav şerê çekdarî”. Berkeniya Koçer hinekî Reşît têşîne, lê ew li xwe xûya nake.

- Tu çima serast napirsî; ka nirînên te di PKK ê de çine. Ne ji ber ku, tu dostekî wan e yan jî tirsa min ji wan û bilî wan heye ku, bihêle ez pesnên wan bidim. Lê di nirîna min de û li gor heyama jiyopolotîk ya îro, PKK ê yeke ji hêzên ku, dikaribin tevgereke şoreşgeriyê û ne tenê di nav Kurdan de, na, yek dikare bibêje ku di herêma rojhilat tev de. Ango, hêvî di wê daye ku, ew karibe bi rola dîrokî ya tevgera şoreşgerî rabe û ji nuh ve hêvî û armancên me vejîne, eger ku ji hin nesaxî û şaşiyên xwe vegere û xwe ji wan rizgar bike. Koçer bi gotinên xwe re li çavên ewî dinire; ka çi akamê li ser wî dihêle û ka ev gotinên wî, dê bivetiyekê bighîninewî yan na, tevî ku, gotibû: ez natirsim jî.

- Weke çi. Reşît, bi dilgermî, dipirse. Piştî ku, Koçer ew, bi nirîn û dîtinên xwe, veciniqandibû.

- Têra wan jî nesaxiyên wan ên civakî û konevanî hene. Lê yek dikare li ser hin tiştine berz raweste û eger ku ew çareser bibin, dê yên biçûk ji ber xwe bipişifin û li gor dîtina min ên sereke evin; di pêşî de û ji berî hertiştî, dive biryara her-partiyekê di destê wê de be, ango dîtin û nirînên wê ji derve de lê netên barkirin û di evê yekê de, mixabin, PKK ê ne xudiya biryara xwe ye. Tiştê din ku, dihêle yek ji pêşeroja PKK ê bi tirs be û weke ku, bi erebî jê re tê gotin: “nimêja ji kesayetiyê re; ji serok re” . Helbet em dizanin ku, ev yeka jî ji hin sedemên olperestî û li gor perwerdiyeke olî ku, hêştî em hertim li benda Xwedayekî bimînin da ku, me rizgar bike, tête û wilo PKK ê jî Xwedêyek ji xwe re daniye û eger wî gote wan bimir-bimir, bimîninbimînin.

Ev ton têkelî di konevaniyê de wêran û mirin bi xwe ye û helbet ev derd ne bes yê PKK ê ye, hemû partiyên me bi evî derdî ketine û lingê sisiyê ji evê nesaxiya ne pîroz, ewa ku, her yek xwe tenê dibîne û bi çavekî biçûk, eger ku em nebêjin, bi çavekî dijmantî li partiyên din dinire û wilo, ew şerên xwe û dijimin ji bîra dikin û wî şerî bi şerekî rewrewkî û birakujî dguhêrin.

Koçer dixwest hîne pêde biçe, wî vehesiya xwe biribû û di rûniştinên wilo de axaftin û kişandina cigareyan bi wî xweş dibûn û di dema ku, dêst davêje pakêtê, Reşîtê Horo evê yekê weke derfetekê dibîne, da ku, berevaniya dîtinên xwe bike.

- Bes divê tu ji bîra nekî ku, di roja îro de, em ne di rewşeke surûştî de ne û heyama şer ji partî dixweze ku, yekxwedî biryar hebe û ew, çêroka demukrasiyê, hinekî bidin şûn; eger ku, ne ji Sitalîn ba, Şoreşa Oktoberê dê têkbiçûya.

- Girêk eve. Em ne li dijî serok û serokatiya partiya ne; ev şanîkeke dîrokê, gerdûnêye. Lê em li dijî ewê nirîna ku, dixweze doza miletekî bi kesekî ve girêde ne, erê nîşan û simbolên miletan hene, lê bi tinebûna wan ew doz tine nabe. Dive em li xwe nenirin ku, nema em dikarin serokekatiyeke şûngir derînin, ta ku em rabin û doza kesekî têxin şûna pirsgirêka Kurd. Ango bi dehan ên weke Apo hatin û çûn û dê bên û herin, lê ev doz û milet dê her bimîne û raneweste, heya ku dighe armancên xwe.

Kişandina hilmekê ji cigarê, dihêle axaftina wî bête birîn û bi dûyê wê re ramanên xwe yên ku meyîne berdide. Weke evê nimûneyê li cem miletê Ereb jî çê bû û ew heya bi roja îro ji bin seriyê ewê yekê dikşînin û nema dikarin ti gavên din ji yên E. elNasir bêtir bavêjin, ji ber ku, ewana jî di nameya wî de tekûzî dîtin û te bizava rûs û Sitalîn anî, eynî ew jî weke ya Ereba bû û roja îro tu rewşa wan jî dibînî ku, ew ketine çi kirasî. Koçer xwest weke lehiyekê bi ser wî de bîne û bihêle ew hemû pêde biçin.

- Bes, di nirîna min de, ev ne gunehê Apo ye. Reşît û ji berî bavê Şêrînê, ew bi xwe li xwe matmayî mabû ku, çawa weke her car nepijiqî ser çavên evî jî, tevî ku, gotinên wî ji yên ku, di riwê wan de dikire qîre-qîr kûr û girantirin.

- Na, ew jî di evê meselê de gunehkar e û ev yeka li dilê wî jî, mîna hemû serokên rojhilat, xweş hatiye. Lê gunehên mezin ên milet û nûnerên wan e, ewên ku, ji bilî hejandina serî û lêdana çepikan ti karî din nakin. Divê ji berî hemû tiştî ev nûner û di hemû waran de, xwe bi pêş xînin û xwedî pispor bin û bi rastî, bibin dengê evî miletî û wilo ew karibin pir dengan di yek sazûmanê de bi pejrînin.

Û heya ji berî Koçer bersiva wî bibîse jî, ewî dizanî tiştê ku, ew îro di rojhilat de dixweze, xewneke; ev rewş û heyama ku, ji hezarê salan ve têtê meşandin, dê di roj û şevekê de û bi dîtin û hêviyên hin rewşenbîran, neyê herifandin. Lê tevî ewê yekê jî, ewî dengê xwe, di evê çêrokê de, bilind dikir û di wê baweriyê de ye ku, ne ji “Xwedê” de hatiye ku, ev milet demokrasiyê bipejirîne û ewê din na.

- Ji bîra neke ku, li dû evê rewş û sinciyan, dîrokeke dirêj ji perwerdekirineke şaş radiweste û dîrokeke dirêjtir gereke ku, ew bête guhartin.

- Belê, bes tu jî ji bîra nek ku, milet- ... Dûmahîk Rûpel: 17

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-dîrokê diguhêre û ne dîrok miletan boyax dike û rûçikên reng-rengî ji wan re çêdike.

- Ma evê nebe sedema ku, partiyên me, ji îro bêtir, ji hevdu bizên. Bavê Şêrînê dipirse.

- Na, eger ku demokrasî hebe, nirîn û nirîna yê din hebe, perçebûn dê tinebe. Reşît bersivê dide û li Koçer dizîvire û dipirse: Tu dibêjî, dê çawa ev zanyarên me bighên ewê radeyê. Bersiva wî ji Koçer re tiştekî nuh bû û belkî ji bavê Şêrînê re jî nişkabûnek bû. Lê Koçer ev nermbûn û pejrandina yê din, ji aliyê Reşît ve, vegerand du tiştan; an ew ji bingeha wî ya komonîste, yan jî ew dixweze dawiya çêrokê û bi çi ancamê be nexeme, bîne.

- Eger ew giropên ku, yek di wan de hêviyê dibîne, hêza xwe bidin hev û têxin raja xwe û ne di ber yên mirî de birjînin, wê hîngê yek dikare bibêje ku, me gava destpêkê, di riya azadî û rizgarkirinê de, avêtiye.

- Ev nirîneke şûnketiye. Reşît dixweze wî, bi gotinê, bitevzîne. Lê Koçer têra xwe hatibû guvaştin û civlandin; nema gotinên bi evê rengî wî dikulînin, lewre bê dudilî û xwêdan lê vegerand.

- Na û ev yeka ji min re ne pêwîste ku, tu min dixînî bin kîjan konî de. Lê bi dîtina min û gava ku, miletek perçeyî du paran dibe; xwediyên raman, biryar û destlatiyê û yên mayî jî ji bo bi cihanîna ewan biryaran û xwediyên biryaran dibin kole, dê rewşeke weke ya me derxe holê û helbet dê di hundirê her perçeyekî de jî pile û radek hebin; mîna ku, di nav yên xwedî raman de hinek derdikevin û biryarê bi dest xwe ve tînin, tevî ku, hin caran lêhatin û keys dihêlin hinek derkevin pileya jor, bêyî ku, ewana ti kar kiribe yan jî ew li gor ewî cihî û radeyê bin. Koçer ji dûr-dûr kevir davêtin konevaniya PKK ê û weke ku, li tûjkirina Reşît bigere.

- Bi nirîna te, her yek nikare bibe xwedî raman. Reşît bi çavin sor li devê wî dinire.

- Na. Koçer bersiveke kurt dide.

- Bi min nirînên te hinekî biyanin û ne dûrî felsefeya... Qêrîna ku, ji derve ve tê, dihêle hersê rabin ser xwe û bi derve de bibezin û ewana ji rawestina di riwê hev de bi dûr bixe.

- Dema ku, çavên wan li ewî ejdehayî dikevin, ew jî mîna yên li hewşê, di cihê xwe de, ziwa dibin û vemirtina wan ne ji mezinahiya mar dihat. Dîtina zariwê ku, di devê marê zer de, dipir-pitî, hêştibû xwîn ji damarên wan bireve û devê Dojehê li ser wan vebe û heya ku, ew lê kom dibin û wî dikujin, zaro bi tevayî di devê wî de winda dibe. Lê ew çend gotinên diya zaro, ji berî ku ew ji ser hişê xwe here, hêştin ku, zaro ji devê ewî ejdehayî bi derînin.

- 7 -

- Koçer.. Koçer. Bi bihîstina navê xwe re, çend caran, li dora xwe dinire, lê ji bilî pozê xwe û çavên segekî reş, ti tiştî din li pêşiya xwe nedîtin. Gavek bi şûn de avêt, seg du gavan bi pêş ve davêje û bi evê yekê re, Koçer lingên xwe dide bê; her ku ew dibeze, seg nêzîktir dibe.

Piştî bazdaneke riswa û bi xwêdan ku, hêşt pişt li wî bişke, dinire ku, avahiyeke bilind di pêşiya wî de dertê û dihêle dilê wî fireh bibe. Bi ketina hundirê wê de, derî li dû wî tête girtin û bêyî ku, bihna xwe derîne, bizavên xwe dike ku, di ewan pêpelokan re derkeve qatê jor. Lê her ku, ew bi ewan kabokên şikestî ber bi jor de derdikeve, riya wî teng dibe û bêtir bihin li wî diçike û piştî çend mitran, laşê wî di hundrê ewê berqefê de tête guvaştin; her ku ber bi pêş ve diçû, ew ode divegerî û dibû berqefeke teng, dihêşt bihna wî bi carekê teng bibe û dil jî, bi xurtî, lêde.

Di dawiya berqefa teng û tarî de û piştî hin bizavên zikxuşê, çavên wî bi çirûskên ronahiya ku, ji dawiya wê ve diherikîn dikevin. Lê dengê segê ku, di piş guhê wî de direwe, dihêle dîwar bêtir li wî teng bibin û ew gurzê çirûskên ronahiyê jî-bireve. Bi hejandina milên wî û bihîstina navê xwe re, Koçer çavan vedike. Ew heya bi demekê titiştî ji hev dernaxe, lê gava çavên wî bi riwê Kamîranê Hemo dikevin, ew hinekî şiyar dibe û ji bin sawa ewê xewnê derdikeve.

- Te çiqas xwêdan daye û tu çima heya bi nuha di xew de mayî.

- Roj baş. Koçer silavê vedigerîne û bêyî ku, li pirsên wî vegere, ji ser têxt dadikeve û li şimikê digere. Piştî ku, dixe lingên xwe, ji odê bi dertê û heya vedigere, Kamîran jî cezwê qehwê digel du piyalan datîne ber xwe.

- Lavan ji min bike û ji berî ku, qehwe sar dibe hinekî bilezîne û pore xwe ziwa bike. Gava ku, Koçer ji xew şiyar bûbû û nemze piştî xewna çûyî, wî bi hûrbûn li dora xwe nemeyzand, lê piştî vegerîna ji avrêjê û bihin kirina qehwê, dinire ku, wî ne bes qehwe aniye, lê heya xema taştiyê jî xwariye.

- Ez nizanim, dê çawa ji bin barê.. . Lê Kamîran nahêle ew hevoka xwe bi serî bike.

- Ez dikarim van gotinan ji tevan bibîsim, bes ji te na û ev rûmetgirtina ji kuve li ser te bariye, tu dûrî evan tiştaye. Kamîran bi rûkenî dibêjêyê û di dawiyê de û bi lêdana kulma di zikê wî de, li rewşa wî dipirse.

- Weke berê ye, titişt lê kêm-zêde nebû ye... Evê sibê Xwedê xêra te bide. Koçer piştî bihinderxistineke kurt dipirse.

- Xûya ye ev hatinên min ên li ser hev, hêştiye tu hinekî ji min dilteng bibî.

- Kiye ewê ku, gotinên pûç dicû, tu baş dizanî ku, ez dixwezim hertim te bibînim, bes hatinên te bûne mîna mêvandariya cinan, yek nizane dê tuyê kengî postikê xwe bavêjî û li yekî bibî mêvan.

- Yên cinan, lê pêriyan.

- Tu ji ya xwe namînî, lê tu ya rast dixwezî, yên pêriyan xweştire. Piştî ku, koçer cixareyekê, bi fincana qehwê re, pêdixe bersiva wî dide û dihêle Kamîran bi nîv henekî lê vegerîne û bibêje.

- Tu yê bi ewî derdî herî û tu ti pêriyan di nav nivîna xwe de nabînî û bi ra te negot: ka te karek ji xwe re dît lê na. Kamîran bi evê pirsê re dawiya henekan tîne.

- Ez dikarim bibêjim ku, te karek ji min re dîtî û ji bo ewê yekê tu hatî?. Koçer ji zûde ew karê ku, Agob jê re dîtibû berdabû û li karekî digeriya.

- Him.. m, tu hîne dikarî ramanên ên hemberî xwe bixwînî. Belê, bes bawernakim ku, tu razî bibî.

- Ji neçarî yek goştê dîkan jî duxe. Kamîran dinire ku, kenekî reş li ser riwê wî belav dibe, dihêle yek têderxe ku, ewî di rojin teng re derbas dibe û ewî ev yeka hîne bi ketina hundir û dîtina cezwê qehwê ku, çawa tozê li ser girtiye, re naskiribû.

- Kêfa min ji dawiyên tiracîdî re nayê.

- Kê gote te ku, jiyan ne qeşmertî û lîstikeke dînaye. Ez carina dibêjime xwe: belkî ev tişt giş xewn bin û ne dûre ku, rojekê.. yan jî kêlîkeke din, jê şiyar bibim û titiştî li pêş xwe nebînim; ango ne te û ne jî odê.. evî bajarî, li pêş xwe bibînim, hertişt bi damrandin û vekirina mijangan re winda bibe. Bi gotineke din, em dikarin bibêjin: nedûre hebûna me, bi tevayî, xewneke mirovekî be.

- Naa a; min hertişt bawer dikir bes ku, ez rojekê te di vê rewşê de bibînim, ev ne di bala min de bû. Dîtinên olî û ramyarî bide aliyekî, bes pir rasteqîn hene ku, ti carî yek nikare çavan li ser damrîne, heya bighe zanyarên felek û biyologiya jî, ewana ti carî hebûna zemîn û jiyanê înkar nekiriye.

- Dîtinên wan jî di bin siya olî de pişkivîn. Koçer dibêje û ew radibe ser xwe da ku, taştiyê-

... Dûmahîk Rûpel: 18

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-amede bike, lê dengê Kamîrên wî dide rawestandin.

- Bi ra te bihîst ku, duh berbangî, leşkerên Turkan êrîşên xwe birin ser Kurdistana bakur. Gotinên wî heya bi demekê di guhên Koçer de lûs nebûn û evê salixê gewrepana bîr û bûyarên ku, ji berî demekê lidarketibûn, vegerandin; çawa Ejdiha zaro daqirtand û rûniştinên wî yên li ber tilivzyonê û şirovekirina zanyaran ji ewê bûyerê re, heya dighe ewê xewna ji berî kêlîkê û piştî ku, ew hinekî ji bin akama evan bûyeran dertê û weke ku, yek bi xwe re bi axêfe, dipirse.

- Merema te, ew êrîşa ku leşkerên Turka birine ser cîgirên PKK e, da ku, wan cîgirên piştgir ji dest wan bibin.

- Û çima tu bi evî zaravî li min vedigerînî. Kamîran hinekî bi hişkî û piştî ku, bihna gunehkariyê di gotinên wî de dibîne, vedigerîne. Lê bêy, ku, Koçer bersiva wî bide, pirseke din jê dike.

- Helwesta hêzên wê derê çiye. Ew bi gotinê re vedigere cihê xwe yê berê û cigareyeke nuh pêdixe.

- Tu dibêjî dê çi be; radiyowa Kurdî û li ser zimanê herdu hêzên sereke got: dive Turkiyê leşkerên xwe, îro berî sibe, bi şûn ve bikşîne. Û gotin: ev tişt li dijî peymanên navnetewîne û ew destdirêjiyeke Turkaye. Lê Koçer şeva çûyî û li ser tilivizyona Sûryê dîtibû ku, çawa pêşmergeyên başûrî Kurdistanê û digel leşkerên Turkan di ser cendekên girêlayên PKK ê re rawestiyabûn.

Ev dibû cara dudiyan ku, Koçer ji ber Kurdayetiya xwe ve û bi rengekî beloq, fedî dikir; erê cara pêşî di dema serpêhatiya Helebçe dabû ku, di ewan rojan de heval bi xwe û karûbarên, ji ber Kurdên başûr ve, ketibûn nav keftelefteke giran û wî jî xwe dûrî wan kiribû û bi xwe û çêrokeke evînî de ketibû. Lê ew tiştekî wî yê xasma bû û bi kesîtiya wî ve girêdayîbû. Bes evê carê wî didît ku, ev fedîbûn bi hebûna wî ya netewî ve girêdyiye; “Cara çûyî min xwe bi ewê çêrokê ve girêdabû û ne kesekî din zinar danîbû ser zikê min”. Lê evê carê wî xwe weke çêlgurekî girêdayî ku, çend seg û di bin dîtinên gurên bira de ku, êrîşî wî dikin û birînine nuh, di gewdê wî de vedikirin, didît.

- Mal a wan e. Koçer bi qeşmerî dibêje.

- Te çi ji wan dixwest da ku, bikirana û wan nekir.. . Tu dibêjî dê çi gerek ba; destên wan maçîkirana da ku, ew ji herêma wan derketana.

- Eger ku, tu mirovekî dest salt bî û kesekî xwînî, bê fermana te, derbasî mala te bibî, tu yê nikaribî li pêşiya dijminê wî jî rawestî ku, ew jî derbasî hundir mala te nebî û wî bi darê zorê ji wir dernexî. Tu dixwzî evê yekê bibêjî. Koçer tinaziya xwe dubare dike.

- Em xweş dizanin ku, Hukometa Fîderal bizaveke nuhe û eger ku, Emerêka destên xwe jê bikşîne dê, di navbera roj û şevekê de, hertişt bête xwar û weke ku, dibêjin: emê li ber lingan herin, nemaze em baş dizanin ku, em di kîjan heyamê dene û helwesta ev rêjîmên li derdora me çiye, ji meseleyên Fedraliyê û di evê ortê de û di roja îro de PKK ê dixweze başûrî Kurdistanê ji xwe re bike meydana êrîşan, de ka em bipirsin; sûcê kêye û kî gonehkare.

- Li ser Xwedêye, eger ku, ew hebe. Tu dizanî ku, ez gihêştime ewê baweriyê ku, di demên Xwedê aferînên xwe û her yek ji tiştekî, dafirandin û piştî ku, titişt ji bilî pîstiyê di dest wî de nema, rabû em Kurd jê afirandin. Koçer bi qerfeke fereh van gotinan dibêje dostê xwe û cigara nav tiliyê xwe davêje nîvê hundir.

- Gunehe ku, îro yek bi tera bi axife. Ew hinekî li ber xwe dikeve.

- Kuro.. aniha tu dikarî bi min bidî fêmkirin ku, ev serokên partiyên me, li ser çi bingehê ewana maf daye xwe û dikarin bibêjin: Ev perçê Kurdisanê yê meye û çênabe ti kes, partiyên din li ser hebin, bila ew herin perçeyên xwe. -Tevî ku, dijminê me û her roj miletê me qir dike, ne tenê wilo, em hîne rê didin û li gor mentiqê wan, bi evê yekê re didin û distînin û rê didin ku, dijminên perçê din jî derbazî nav me bibin û şerê birayên me bikin. Tu bi min re nabînî ku, gotina “derkevin”, gereke ji dijmin re bête gotin û ne ji birayên perçên din re. Em bi evê ton konevaniyê û bi evan dîtinan, perçebûnê kûrtir dikin.

- Ev rewş rastiyeke û tikes nikare ewê înkar bike ku, di roja îro de, ji her perçeyekî re xasmayên wê hene û divê em evê yekê ji bîra nekin û di ser re hilnegavin. Tiştê din, ti kesî negotî ku, partiyên başûrî Kurdistanê ji kiryarên Enqerê û derbazbûna wan a hundir Kurdistanê re razîne, yan ew yeka bi dilê wan e. Lê divê em zanibin ku, wizeya wan heya bi kîjan pileyê ye. - Tu bi Xwedê dikî tu dikarî bi min bidî fêmkirin; ka xasmayên me her perçakî çine. Koçer bi riwekî sar dipirse. - Tu çima dixwezî, xwe di ser tiştan re bavêjî; tu nikarî çavên xwe li ser cigrafya îro damrîne û van sînorên ku, me ji hev cuda dikin, ji bîr bikî. Û weke ku, ji berî nuha jî min got: Em hîne biçûk û qelsin û di roja îro de û li gor sîstema cîhanê ya nuh, eger ku ne bi riya hêzên derve û piştgiriya wan be, emê nikaribin ti tiştî ava bikin. Lewra dive em bi hişmendî, bi evan meseleyan re, bidin û bistînin.

- Binir, mîna ku Nêtşê dibêje: “Gereke yê qelis nemîne, tuneyî bibe”. Ez bi evê dîtinê re me, tiştên ku bi destên wan ava bibin, dê bi destê wan jî bên herfandin.

- Ev nirîneke xurûye û li gor dem û civaka ku, Nêtşê tê de dijiyabû û li piş van nirîn û dîtinên wî hin tiştên veşartî, hebûn. Tiştê din, ev ne ew deme ku, yek her tiştî bi destên xwe bike û divê em sûdê ji dijberiyên dijminên xwe bibînin. Dema ewan gotinên girs, mîna kambiredor û Impiriylîzimê jî çûye ku, em hertiştî bavêjin sukra wan. Kenekî çêkirî û bê şerm ji Koçer derdikeve û dihêle Kamîran gotinên xwe bibire û amediyên xwe bike da ku, ji oda wî derkeve.

- Bibore, xûya dike ku, nebes çênabe em şerê şêw û rengê sîstema Emrêka, ya ku eşkere li dijî miletên cihana sêyem e, bikin, lê heya şerê sermiyandariyê jî, di roja îro de, bive ye. Ew salên dirêj û xebata di hember wan de, xewnek bû û bi ser evan tiştan de, tu loman ji min dikî ku, ez xwe di ser rasteqînan re davêjim û li gor dilê xwe daxêfim. Pêkenîn û qerf ji gotin û rûyê Koçer difûre.

- Eger ku emkê bi qeşmeriyan rabin hevdu, ez gotineke din li axaftina xwe zêde nakim. - Anuha tu bi -ez nebêjim tu bi Xwedê dikî- hema tu bi çi dikî û sûnd duxî, bila bi wî be; Ev tiştên ku a nuha te gotine, baweriyên te ne yan dîtinên partiya te ye. Kamêran, careke din, bihna pêkenînê di gotinên wî de dibîne û eger ku, ne ji ewan demên dirêj û naskirina wî ya kûr ji Koçer re ba, ku ew ji dilekî kizirî bi evî rengî dirame û daxêfe, dê ji zûde ji oda wî derketiba.

- Ti cudatî tineye. Kamêran bersiva wî dide û ew dizane ku, ewê baweriya xwe pê neke. - Mixabin; tenê ez li tiştekî şêt dimînim ku, çawa yek dikare, di navbera roj û şevekê de, baweriyên xwe biguhêre, mîna ku soleke xwe diguhêre; tu ji Markisiyekî hişk bibî çêlikekî birciwa. Koçer, hevoka dawiyê ser rast davêje ser Kamêrên. - Ne weke tu dibêjêyî û tu yê bibînî ku, ew çend leşkergehên PKK ê, di Kurdistana Îraqê de, dê bibin belgeyek di destê Conta Tirk de ku, êrîşên xwe di bin siya ewê yekê re derbazkin. Û tiştê din, mixabin ji ewê ku, nayê guhartin re ye, ewê li ser yek bîr û bawerî bimîne û nebîne ku, cîhan li derdora wî tête guhartin.

- Demê ku, tu li ser derbasbûna PKK ê li başûrî Kurdistanê di axêfe, yek dibêje qey tu li ser hêzeke ji Emrêka Latîn di axêfî û ne hêzeke Kurdistanê ku, ji mafê wê ye; helbet ne tenê PKK ê, lê her hêzek ku xwe Kurdistanî dibîne, ew li her deverekê bêne dîtin û xaka Kurdistan jî cihwarê kar û xebatê bibînin. **... ( Berdewam Dike ) ...**

# HEVPEYVÎNEK LI GEL QAÇAXÇIYÊ BERÊ SEYÎD EVDOYÊ BATÊRGIZÎ

Hevpeyvîn:

**Salih Kevirbirî**

*rojnameger@hotmail.com*

( Stenbol - Turkiya )



-Di destpêka salên 90-î de, ji ber xirecira siyasî, mecbûr dimîne axa bav û bapîran biterikîne. Nêzî 20 sal in, li Swêdê penaber e. Gava min jê pirsî ku bi çend hevokan behsa xwe ji me re bike, çavên xwe girt û devê xwe vekir:

'Ber û bapîrê me ji Gundê Batêrgizê ne. Bapîrê me ji wir hatibûn, li Xanikê bi cih bibûn. Bavê bapîrê min Feqe Emer mezinahiya temamê seyîdên wê dorhêlê dikir. Piştî ku kurê wî Hacî Evdile rabû, got ezê koçeriyê bikim. 300-400 pezên wî hebû. Li gelek gundan digeriya. Emrê min 14 bû ez bûme sermiyanê malê. Di sala 1947'an de li Adirmanê ku wekî zivingekî bû ez hatim dinyayê. Zivistana em diçûne çiya û havîna em dihatine çolê. Zivistanan wekî koçerî me pez dibir çiyan, lewre jî ez li wê derê ji dayîk bûme. Pêşî aboriya me baş bû, paşî bavê me jineke xwe anî. Em du bira û xwişkek bûn. Tevî dayika xwe em ji cem bavê xwe derketin. Zarokê mezin ez bûm. Lewre jî ez di zarokatiya xwe de bûm sermiyanê malê. Barê malê hemû kete ser pişta min. Me gelekî zehmetî kişand. Paşê aboriya me hino-hino ber bi başiyê ve çû. Me ji Mezrê bo Xanikê bar kir. 20 malek hatin ew gund kirîn, em jî bûn şirîkê wan. Êdî em jî bûn xwedî mal û milk. Paşê jî jiyana qaçaxçîtiyê, bi salan me da dûv rêça qaçaxê...'

*Piştî van gotinan min zêde dirêj nekir. Li mala wî ya li Akersberga ya Stockholmê, min pirsî, qaçaxçiyê berê Seyîd Evdoyê Batêrgizî bi dilekî pak bersivand...*

* * * *

**Mamê Seyîd, bi pirseke wiha destpê bikim; te çend salan qaçaxçîtî kir, gava te dest bi karê qaçaxiyê kir, temen ango salên te çend bû?**

Salên min li dora 18-19 bû, min dest bi qaçaxiya ser hidûd kir. Berî ku bibim 20, me xwe li sînoran dixist. Temenê min niha 63 ye. Ev bû 40 sal. Wê demê, em li gundekî bi navê Xanik bi cih û war bibûn. Me karê erd dikir ji xwe re. Gundekî li ser sînor e. Wê demê li her gundê li ser hidûd ango sînoran, rêberên binê xetê hebûn. Bi riya wan rêberan, em binxet dibûn û me qaçaxî dikir...

**Emê behsa wan rojan bikin helbet, lê ji meraqa xwe dipirsim, qaçaxçîtiya te çend salan berdewam kir?**

Birazî, heta sala 1975-an û piştî wê -bi kêm caran be jî-me karê qaçaxçîtiyê berdewam kir. Gava di sala 1980'î de cûnteya leşkerî hate ser hikûm, êdî tu 'nan' di karê qaçaxiyê de nema. Lewre me ev kar terikand.

**Ezbenî, li gori te bi çend gotinan 'qaçaxçîtî' çiye?**

Qaçaxçîtî, di dewrana me de îdareye wî rexî (alî) bû. Miletê îdara xwe pê dikir, ne ku tiştekî baş bû. Mecbûrî bû.

Çawa dihate kirin, bi hespan an bi tenê. Ji bo qaçaxiyek pêk were, çend kes digihaştin hev mesela?

Em ji aliyê Herêma Torê ne. Em komek li wir dibûn yek û me berê xwe dida wî alî hidûd. Hidûdê Sûrî me digot. 15-20 kes li hespên xwe siwar dibûn û dihatin, heger rewşa rêberan û sînor baş bûye, em derbas dibûn. Hinek dihatin kuştin, hinek derbas dibûn. Kefenê qaçaxçiyan her di stûyê wan de bû welhasilî kelam...

***Qaçaxçîtiya çi dihate kirin?***

Qaçaxiya çayê dihate kirin. Tiştên ku li aliyê bakur tunebûn, qaçaxiya wan dihate kirin. Mesela qaçaxiya cixareyan dihate kirin, qaçaxiya qûmaş, qaçaxiya malên elektronîk-elektrîk ku zêdetir malê japonan bû dihate kirin. Bi vî awayî aboriya xwe pê dikirin.

**Gelo mirov hebûn ku ji bo kêfa dile xwe, xwe li sînoran dixistin?**

Na! Kêfa çi? Mirov nikare ji bo kêfa xwe here û were. An divê mirov 'ehmeq' bûya an jî 'Restemê Zal.' (em dikenin) Meseleya nan bû, nan hebûya kesî qaçaxî nedikir. Lewre her tahlûke hebû. Mesela mirovên gelekan li aliyê Sûrî hebûn. Em diçûn me ehlê xwe didîtin. Ji wir jin ji xwe re dixwestin. Doza mirovantiyê li hev dikirin.

**Roj çebûn ku ciwanek derket û got min jî bi xwe re bibin an?**

Helbet kesên wisa derdiketin. Bi taybetî ciwanên ku ji cem dê-bavê xwe derdiketin. Ji bo dabara mala xwe bikin, dihatin cem me digotin; 'me jî bi xwe re bibin'. Gelek xort bi me re hatin qaçaxiyê. Lê di qaçaxiya min a 20 salan de, tenê carek ciwanek birîndar ket. Me ew derbasî binxetê kir, li wir hate dermankirin û baş bû. Elhemdulîlah bi min re qet qewimînên xerab çênebûn!..

**Qaçaxçîtiya te zêdetir ji Herêma Mêrdînê ber bi binxetê ve bû? Riyên ku qaçaxçiyan bi kar dianîn kîjan bûn?**

Me riyên li mintîqeya xwe bi kar dianî. Riya me di navbera Nisêbîn û Cizîrê de bû. Mesela ez di Têzxirabê re diçûm, di Xanik re diçûm. Em ji aliyê Eznawirê ve diketin nav axa Sûrî. Em derbasî Zorava dibûn. Kelhesenakê, Dêrûnê, Maşoq hebû. Heta aliyê din ku em Rexê Zêwikê dibêjin, Dêrûna Axê hebû. Li aliyê Narûnciyê, Xirbeblika hebû, Batirzan hebû...

**We tiştên qaçaxiyê ji kîjan bajarî dianî?**

Ji ber Qamîşlo nêzîkê herêma mebû, me ji wir dianî. Me ji Maşoqê jî dianî, me ji Tirbespiyê jî dianî. Piştî salên 70-î, di zemanê Ecevît de, carinan em bi pasaportan jî diçûn. Gava pasaportên me hebûn em diçûn Helebê jî.

**Gava hûn bi pasaport jî diçûn, we malê qaçax dianî. Li ser deriyên hidûd pirsgirêk dernediket?**

Gava malê me hindik bû dernediket. Lê dema malê me zêde bû, problem derdixistin aliyê tirkan. Wê demê jî, me bertîl-mertîl dida wan û me malê xwe derbas dikir.

**Herkesê bixwesta dikaribû bibûya qaçaxçî? Mesela di nava qaçaxçiyan de jî 'nîv-mafyatî'yek tunebû? Kesên astengî derdixistin hebûn?**

Na astengî tunebûn, lê herkesî di herêma xwe de ev kar dikir. Ji ber ku gava em biçûna herêmeke- **... Dûmahîk Rûpel: 20**

## HEVPEYVÎNEK LI GEL QAÇAXÇIYÊ BERÊ SEYÎD EVDOYÊ BATÊRGIZÎ ... Dûmahîk:

-xerîb, me nizanibû leşker li ku hene. Her wiha meseleya mayînan hebû. Lê gava em ji dorhêla xwe diçûn qaçaxiyê, me dizanî xetere û talûke li ku ne. Di destpêkê de mayîn tunebûn. Paşê ji hidûdê Sûrî heta Silopî mayîn çandin. Deq bi deq me cihên mayînan dizanibû. Car dibû me mayinan ji çalan derdixist û me şop ji xwe re çêdikirin. Ji rexê Sûrî ve jî hevalên me hebûn, ew jî ji wir ber bi me ve dihatin û cihên mayînan ji me re digotin. Me bi çarlepkî lêdixist û me ew mayîn ji bin erdê derdixistin.

**Li herêma ku te qaçaxî lê dikir, çend malbat hebûn ku dabara xwe ji qaçaxçîtiyê dikirin?**

Gund hebûn ku 6-7 qaçaxçî jê derdiketin. Nizanim çend malbat dabara xwe pê dikirin lê baş dizanim ku gelek kesan ev kar ji xwe re hilbijartibû ku ez jî yek ji wan bûm.

**Li ser tevahiya gundê sînor qaçaxî dihate kirin ne wisa?**

Belê dihate kirin. Li tevahiya gundên serxetê karê qaçaxiyê dikirin.

**Herî zêde û herî kêm ji bo sefereke qaçaxiyê pêdivî bi çend kesan hebû?**

Ev li ser te ye êdî! Li ser kesê diçe qaçaxiyê. Qaçaxiya bidestûr hebû, qaçaxiya bêdestûr hebû. Qaçaxiya pez û dewaran hebû, qaçaxiya hespan hebû. Gava ku bidestûr bû, gelek caran leşker û rayedarên dewletê dibûn şirîkê qaçaxçiyan. Lê gava bêdestûr bû, ew dima li ser hêz û qeweta qaçaxçiyan. Êdî kê çiqas kes derbas bikira. Car dibû qaçaxçiyan 350-400 pez bi qaçaxî derbas dikir...

**Bêtifaq û teşqele, herî zêde te bi çend kesan li sînor xist? Tê bîra te?**

Gava mirov tenê be hêsantir e. Lê car dibe 20-30 kes jî hebe. Çiqas zêde be ewlekarî hewçend dikeve xetereyê. Mesela gava qaçaxçî û leşker li hev biteqînin, parastina mirovan zehmetir dibe gava ew kes zêde bin. Rêber zêde nahêle ku zayîat çêbe...

**Rêber çawa xwe diparêze?**


Mesela ez rêber bûm. Min dida pêşiya qaçaxçiyên din. Me kemînek li wî alî, kemînek jî li aliyeke din datanî. Rêber û çend kesên din jî di nîvî de dimeşiyan. Ev taqtîk e. Divê bi vî awayî tu nehêlî leşker serê xwe rake.

**Zehmetiyên ku derdiketin pêşiya we çi bûn?**

Demên berê leşker û kemînên leşkeran bûn. Vê paşiyê panzer (zerîpoş) derketin ew bûn bela serê me. Piştî panzêran karê me gelek nexweş bû. Panzer derket qaçaxçîtî mir!.. Leşker ji qaçaxçiyan ditirsiyan. Gelek caran leşker dihatin kuştin. Gelek caran ji kemînên xwe derdiketin, diçûn deverên din, hevza xwe dikirin ji qaçaxçiyan. Lê talûka panzêran zêde bû. Gava me lê diteqand jî, tesîr nedikir. Di sala 1975'an de panzer hatin. Piştî Herba Qibrîsê. Car dibû me şiferê panzêrê jî razî dikir ango me bertîl dida wî heta ku em derbas dibûn.

**Ji bo binxetbûn û qaçaxiyekê çiqas dema we di riyan de derbas dibû?**

Hidûd li cem me bû. Nêzîk bû. Karwan ji torê dihatin. Bi şev bi rê diketin. Di nava 4-5 saetan de digihane me. Carinan di şikeftan de diman heta ku dibû şev. -Qaçaxî bi şev dibû. Bi roj qaçaxî mirin e. Paşê demekî wisa hat ku leşker li pey karwên diçû heta binxetê jî. Pevçûn derdiketin carinan. Leşker û qaçaxçî li hev diteqandin. Di pevçûnekê de, serbazek (astegmen) li Dêrûna Qulinga hate kuştin. Roj bû, li pey karwan çû, şer derket hate kuştin...



**Car dibû ku ji herêmên dûr jî qaçaxçî dihatin? Mesela ji Serhedê?**

Belê çawa?! Ji Serhedê, ji Xerzan û ji Diyarbekirê dihatin...

**Mamê Seyîd, tu bixwe rêberê qaçaxçiyan bûyî ne şaş bim...**

Belê rast e. Ez û yekî din di dema min de em rêber bûn. Navê wî Smaîl bû, Smaîlê Xelîl...

**Te behsa şerê di navbera leşker û qaçaxçiyan de kir. Ka behsa rojek ji wan rojan bike...**

Carinan şer derdiket. Lê di rêberiya min de kuştin çênebû. Niyeta tevahiya leşkeran ne kuştin bû. Çek diteqand. Ji bo ku ji serbazên xwe re bêje; 'va ye min teqand û li pey şopa qaçaxê me!'. Carek li Zêwikê leşker kemîn avêt pêşiya me. Wê demê rêberê me yekî din bû. Qaçaxçî baz dan, rêber jî baz da û reviya. Şerekî dijwar derket. Leşker û qaçaxçî li hev teqandin bi saetan. Lê divê rêber baz nedabûna. Şertekî qaçaxiyê jî ew e ku rêber nereve. Reva rêber mirina qaçaxçiyan e...

**Şertên qaçaxtiçiyê jî hene? Wekî din çi ne ew şert û şirût?**

Divê rêber jîr be, divê riya xwe nas bike. Divê şarezayê riyan be. Kemîn li ku heye, mayîn li ku heye, leşker li ku heye divê bizanibe. Divê jêhatî be, naxwe mirovên pê re têne kuştin. Divê rêber di neqeba du kemînan de bimeşe, naxwe wê qaçaxî têk here. Leşker her digeriya. Her di kemînan de bû. Me nava rojê bi dûrebînan temaşeyî leşker dikir. Bi şev jî me dida rê. Carek li Zêwikê avêtin pêşiya me. 7-8 hevalên me hebûn. Şer derket kesek ji me hate kuştin. Yekî Zêwikî bû. Mala bavê wî li serxete bû, mala wî jî li binxetê bû. Tenê ew car kuştin çêbû. Ez tu caran birîndar jî nebûm. Birîndarên min jî çênebûn. Koma min bi zanayî tevdigeriya. Hevalekî me hebû, carek bi me re nehat. Bi yekî Giremîra re, -navê wî Hemreşo bû ji Mala Carela- çû. Hate kuştin...

**Kesê ku mir we çi kir ji wî piştî bûyerê?**

Di şer de birîndar bû. Me anî Zêwikê. Li gund rehma Xwedê kir...

**Gelo pêwîst bû ku qaçaxçî bi çek bin?**

Rêber bi xwe divê biçek bin. Bêçek nikare here qaçaxiyê. Qaçaxçî bêçek jî dibin. Parastina wan diket stûyê me rêberan.

**Mesela çêken çawa bikar dianîn? Tiving bûn, çi bûn?**

Wî zemanî tiving bûn. Vê paşiye keleşkof dibirin. Me bi xwe ji nadixwest ku leşker bê kuştin. Heta ji me dihat, me xwe diparast. Heger me leşker bikuşta, dê mintîqa me bidana ber top û tivingan. Gelek kes wê bihatana girtin û îşkencekirin.

**We qaçaxiya çi dikir, we çi bi xwe re dianî?**

Me Çay, qûmaş, caket, cixare ji binxetê-... **Dûmahîk****Rûpel:21**

**HEVPEYVÎNEK LI GEL QAÇAXÇIYÊ BERÊ SEYÎD EVDOYÊ BATÊRGIZÎ ... Dûmahîk:**

-dianî Serxetê. Carinan jî sîleh, fişek. Me titûn, pez, dewar ji serxetê dibire binxete.

**Tê gotin ku têkiliyên qaçaxçî û eşqiyayan hene. Di dema we de kîjan eşqiya hebûn?**

Li aliyê me zêde tunebûn. Hinek Dewrikî hebûn. Yek hebû Smaîlê Nurisk jê re digotin. Mehkûmê dewletê bû. Ji midyadê bû. Bavê Silemanê Hêvik hebû, ew jî mehkûm bû. Eşqiyayên mezin bi qaçaxî diçûn û dihatin. Bi kêrî xwe dihatin.

**Qaçakçiyek salê çend caran ji nav malbata xwe derdiket? Dema diçû çend rojan ji zarokên xwe dûr dima?**

Li gorî kesan diguhere...

**Tu bi xwe salê çend caran diçûyî qaçaxê?**

Ez gelek caran derbas dibûm. Car dibû em 4-5 rojan an jî hefteyek diman. Carinan me rê nedidît, bi rojan em li ser malê ku em derbas bikin diman. Em dihatin ber hidûd, ji ber ku leşker hebû, kemîn hebû, teqwiye hebû em vedigeriyan.

**Roj dibû leşker ji were xeber dişand, digot 'îro neyên, sibe werin'?**

Gava ku têkilî hebû digotin...

**Helwesta leşkerê binxetê ango leşkerê Sûrî li hemberî qaçaxçiyan çawa bû? Yên tirk tên zanîn, Lê yên Sûrî? Li wir jî wekî Tirkiyeyê leşker zêde hebûn?**

Na leşkerê Sûrî, li ser hidûd tunebûn. Qereqolên wan hebûn. Qereqolek li Kelhesenakê hebû, yek li Dêrûna Axê bû. 5-6 kîlometre ji hev dûr bûn.

**Bi qasî ku qaçaxçî ji leşkerê tirk ditirsiyan, ji leşkere Sûrî ditirsiyan gelo?**

Wexta em diçûn bajaran, em ditirsiyan. Mesela, gava em diçûne Tirbespiyê an Qamîşlo em ditirsiyan. Gava pê bihesiyana em ji serxetê hatine, em digirtin û gelek rojan di bin çavan de digirtin. Carekê me rûn bir. Em li gundekî diman. Her roj me tenekeyek dibir Tirbesbiyê. Hevalê min bir, xaltîka min jî pê re bû. Esker, teneke girt. Gumrik kir, hesiband. Ceza kir. Lê ez tu caran li binxetê nehatime girtin.

**Dema qaçaxçiyek dihate girtin, cezayeke çawa digirt?**

Dema dihate girtin, dipirsîn. 'Tu bi kîjan riyê çûyî, hevalên te kî ne, tu bi kê re çûyî? Pêşî ev pirs dikirin. Paşê hepis dikirin, li gorî tiştê ku bi te re girtine. Cezayê sîlehan gelek bû, cezayê çayê sivik bû. 6-7 meh, salek didan herî zêde. Ku kuştin nebûya ceza zêde tunebû.

**Sîlehên ku dihatin malê ku derê bûn zêdetir?**

Piranî keleşkof bûn. Keleşkofên rûsî. Destên hinek ji wan dar bûn, hinek jê hesin bûn. Digotin keleşkofên Sîxo. Ye Rusî baş bûn. Yê Sîxo ne baş bûn.

**Mirovekî qaçaxçî di nava gel de, xwedî qedir-qîmetekî çawa bû? Qaçaxçî xwe di nava civakê de eşkere dikir an xwe vedişart?**

Na veşartî bû. Qaçaxçiyek ku zirarê neda kesî an jî amilbûna wî hebûya mirov pê serbilind bû. Gelek dihate hezkirin. Hinek qaçaxçî hebûn mirov dixapandin. An jî li ser hidûdan zêde guh nedidan qaçaxçiyên xwe. Milet ji wan kesan hez nedikir. Qaçaxçî û rêberên qenc hebûn li mintiqa me ku hêja bûn û navdar bûn jî...

***Navê çendan ji wan bide ji kerema xwe re, kî bûn ew?***

Yekî seyîd hebû mesela. Li aliyê Gundê Diyara gundekî wan heye. Ji ber ku gelek dem derbas bûye nav zêde di hişê min de nemane. Ji Mala Evdê, Taharo hebû. Qaçaxçiyekî baş bû. Cihê mayînan baş dizanî, rêberekî baş bû. Şopgerekî hêja bû.

**Gelo car dibû ku kesekî qaçaxçî an rêber giliya hevalên xwe dikir?**

Belê hebûn. Hem qaçaxiyê hem jî sixûriya dewletê dikirin. Li ser hevalê xwe yê ku deh deqe berê pê re bû digot, dida girtin. Dibû sedem ku dest deynin ser malên qaçaxçiyên din.

**Ev 20 sal in ku tu ji welat derketî. Aliyê kêm bi te re çi ye, tu bêriya çi dikî?**

Mirov bêriya miletê xwe dike, ehlê xwe, hevalên ku bi hev re mezin bûne dike. Piştî ku min mafê rûniştinê standiye, ev 9-10 sal in ku diçim gund.

**Tu difikirî ku yekser vegerî welêt?**

Ez difikirim lê ez tenê dimînim. Zarok li vir mane. Qumrî -xanima wî- jî dibêje, ez ji ber zarokan nikarim vegerim. Zarok hemû li vir xwendin. Li welat wê ev îmkan bi destên wan neketa. Swêd û Tirkiye ne wekî hev in. Welatekî paqij û demokrat e. Dewlet ji mirovan re baş e, ferqa xerîban û swêdiyan nake. Min ji xwe re bexçe daniye lê dîsa mirov carinan aciz dibe. Çiqas xweş be jî, cihê ku mirov lê mezin bûye cuda ye. Niha yekî swêdî bibe gundê me, 4 rojan îdare nake! Lê belê welat e, bi me xweş e!..

**Mamê Seyîd Evdo, ezbenî mala te ava ji bo vê gotûbêja xweş...**

Xweştir birazî, siheta te xweş.

# DARISTAN DI ÇAVAN DE



**Baranê Sindî**

*barano@mail2world.com*

( Dêrîk - Sûriya )

Dizek di ber daristanê re borî ... û got:

Gelekî ji te hesdikim ez

Çimkî ji çavan min vedişêrî tu

Û diziya min bi te dighê min!

Pêşmergeyek di ber re borî … û got:

Û ez jî gelekî ji te hesdikim

Çimkî dikarim li nave te

Tivinga xwe bi azadî himbêz bikim

Û çîroka birînên xwe ji darên te re bêjim!

Diladarek di ber re borî… û got:

Û ez jî gelekî … gelekî ji te hesdikim

Çimkî dikarim li nave te

Detstê dilbera xwe bi azadî bigrim

Û bê tirs çavên wê maçbikim!

Û daristan jî kenî; bilind kenî… û got:

Çendî darên min bilind dibing

Siha min a hînik û tarî -giran

Giyayê li nav min dikujê!!

# MIN BIHÎST KU TÊ BÊ



**Sîpanî**
*sipani65@hotmail.com*
( Wan - Turkiya )

**M**in bihist ku tê yê bê
Ji êvarda xew nakeve çavê mi
Dilerizin dest û pê yê mi
Li hev dalin û siyar dibin
Hatiye girtinê medê mi
Bêmedeme
Porê mi buye şûjin
Çemrê mi teliz buye
Gurpe gurpa dilê min e
Pêgemgemokê digerîn im
Di ciyê xweda nasekin im

Min bihist ku tê bê
Ji êvarda hiv li çarda ye
Stêrk diçilwilin
Meh bu adar newroz e
Rojê tîroj da
Gul geş bun
Hewa xweş bu
Çêre hêşîn bu
Dara kulîlk dan
Erd nerm bu
Av germ bu
Teyr û tûya çile wîle
Qaz û qulinga wîle wîle

Min bihist ku tê bê
Ji êvarda zarok nagrîn
Dê yê wana dixebitin
Kevanî li kar in
Malxê li bal in
Cotkaran cot berdan e
Şivana pez dernexist ji guhirê
Neçu ber dewara gavan
Qurban şerjêkirin e
xulpe xulpa sitila ye
Goşt û birinc dikele

Tim tişt bê kêmasî
Amade ne

Min bihist ku tê bê
Ji êvarda niviskar nanivîs in
Xwendevan naçin dibistana
Mamoste dersan nadin

Vala mane çarsû bazar
Kirine al bûka xêlî yê kesk û sor û zer
Dizirgitînin
Xortan tenbûlî jê kir
Rext û çek mil kirin
Kala kopal danî
Pîra tevin û teşî hilanî

Min bihist ku tê bê
Ji êvarda nexweş pakin
Birîna kew girt
Xeyîdî li hev hatin
Lal bi ziman ketin
Ker bigoh bun
Kor dibin in
Gişt li benda te ne

Min bihisit ku tê bê
Ji êvarda gazî gir e girê xwe kirîye
Tev kom kirin e
Bi heva kirî ye deşta
Qamişlo yê Amedê
Hewlêr û Mehebadê
Ezê xalîçe û emenî ya raxim
Doşek û minderan daxim
Reqs û foklor a reng kim
Çil roj û çil şevî dîlan kim
Bila çil awazî lêxin sazbend
Çil meqamî bêjin dengbêj
Ji hefta heta heftê nav xuhê da reş kim
Çil milyonî pê kêfxweş kim
Çil salî jibir nekim.

**( 30.03.2007 )**

# HIN TÊBÎNÎ LI SER NIVÎSA ROJNAMEGERIYA KURDÎ LI SÛRIYÊ



**Hîm Mele Ehmed**
*him.2013@hotmail.com*
( Köln - Almanya )

**B**irayê Imer Kalo, destê te sax be ji ber nivîsa te ya derbarê rojnamegeriya kurdî de (di Dilnamê de). Lê xwezî te bi rengekî ferehtir li ser vê mijarê nivîsandiba. Min bawere gelek kes mîna min dixwazin agahiyên xweştir bizanin.

Mîna, hejmara rûpelên her rojnameyekê, yan jî şiroveyeke kin ji naverokê re. Wek nimûne, hin rojname hene, derdikevin, mirov li naveroka wan dinere, dibîne ku 80% ji naveroka wan gotar û helbestên kevinin, yên berî dehê salan derketne. Ji min re ev rojname tiştekî nû naynin. Yan hin belavokên partiyan hene ku tenê ji 4-6 rûpelên biçûk pêk tên û naveroka wan helbestên kevinin. Ango hema derdikevin ji bo partî bêje min rojnameyek kurdî heye.

Hin agahiyên dî jî hebûn min şaşomaşo kirin. Te nivîsiye Kovara Roj ya partiya sosiyalist berdewame lê ji sala 1991 ve tenê 14 hejmar derketne..?? Çawa çêdibû her 2 salan hejmarek?? Ev çi berdewamiye. Rojnameya Aso jî wisa..

Wekîdî, ez dibînim kêmasiyeke eger mirov belavokên internetê neke di rêza rojnamevaniya kurdî de. Em dizanin ji nêzîkî 10 salan ve tevgereke xurt ya Kurdên Sûriyê di internetê de heye. Ez dikarim bi hêsanî bêjim ku hin malper hene û hebûn giringî û rola wan ji ya 10 rojnameyên çapkirî bêhtir bû. Hem ji aliyê hejmara berhemên ku bi berdewamî dihatin belav kirin û hem ji aliyê hejmara kesên ku ew berhem dixwendin. Di dema ku bêhtirê rojname û kovarên çapkirî her çend mehan derdikevin û tenê hejmarek pir biçûk tê belav kirin, belavokên internetê gihan radeya weşana rojane û hejmara xwendevanên wan bi asanî dighin 50.000 kesî di mehê de.

Serkeftin ji te re
Li gel silav û rêzan

**Hîm Mele Ehmed**

# ROMANIVÎS JAN DOST

## ROMANA XWE YA MÎRNAME BI ZINANÊ TURKÎ ÎMZE KIR






**D**i roja 22 meha Gulanê de, romanivîs Jan Dost li Amedê mêvanê pêşangeha pirtûkan ya duyamîn (Tuyap) bû. Weşanxaneya Ithakî piştî ku romana wî Mîrname bi navê Mir`e Mektup wergerandibû turkî, ew dawetî pêşangehê kiribû û rojeke imzeyan li dar xistibû.

Jan Dost li Amedê bi xwendevanên xwe re rû bi rû û bi kêfxweşî kitêbên wan imze kiribûn. Weşanxaneya Avesta û ya Nûbiharê jî beşdarî çalakiyê bibûn û Jan Dost pirtûkên xwe yên ku li wan weşanxaneyan jî weşiyabûn imze kirin.

## LI HEKARÎ BEŞDARÎ KONFERANSA KURDOLOJIYÊ BIBÛ



Li Colemêrgê romanivîs Jan Dost ji 25 heta 31 meha Gulanê di konferansa duyemîn ya kurdolojiyê de beşdarbibû. Gelek nivîskar û lêkolîner beşdarî wê konferansê bibûn, Jan Dost bi lêkolîneke xwe ye li ser kurdolojiyê û rola wê di berhemdariya Mele Mehmûdê baezîdî de beşdar bibû.

Ji hin lêkolînerên ku di wê konferansê beşdar bibûn evbûn: Mamîsanij, Celîlê Celî, Tosinê Reşîd, Cemîla Celîl, Ibrahîm Seydo, Selîm temo û Şahînê Bekirê Soreklî.

# GORÊN ROMANAN




**Kanî Çolbeg**

*rehwankurd2011@hotmail.com*

( Kobanî - Sûriya )

**M**ezobotamiya herêmeke cûdaye ji her hawayî de, lewra warê gelek şaristaniyan bû, ji wan şaristaniyan imperatoriya romaniyan ya ku gelek tişt û şûnwar li dû xwe hîştin, piştî ku ola xirstiyanî bû oleke fermî di imperatoriyê de sîstemek û stayîlekî nû ji çand û hunerê hatne dîtin jê goristan û sîstema gorên miriyan bûn, di vê demê de gelek gor hatine dîtin bi gelek hawayî bûn, hinek dihatne nas kirin bi navê ( dîmas ).



Yên din bi rengê xaçê dihatine kolandin di zinaran de, weke malekê: Derî bi rengê kevanekê bi alî rojhlat de li her aliyekî kevaneke biçûk hebû yan bi rengê eniyeke sê goşe û li her alîkî yeke bi çûk weke wê bi nêrdewanan derbase hindir dibe, li alî rû odak heye, li çep yek heye, û li rast yek heye, di her dîwarekî de tabûtek heye, di orta hersê xwaniyan de sekuyek heye, li ser wê sekuyê kûpê bi hurmet dihatine danîn (yê Pixûrê, genim, imbît, û tiştine din) di hersê odan de neqşên taybet dihatne dîtin,  wek: Masî, Kewên Gozel, Çengelên awê masiyan û tiştne din. Va renga ji goran gorên malbatan bûn, li Mezobotamiya gelek têne dîtin.

Hîn gelek staylên din ji goran li vê herêmê tên dîtin, wek: Gorên Koşkî, tabûtên Kevrîn, Kolmbruizium, Gorêyn kûpîn, Gorêyn Guloverîn, û hineke din ... Ev gor berî Xristîyan û piştî şewata terman hatne dîtn. Li her warî goristan li dervayî dîwarên bajêrbûn.

**( Kobanî: 6-6-2011 )**

# DILNAME

Rojnameyeke Rewşenbîrî ye Serbixwe ye

7

10-6-2011


## BARŞALONA Û 2 LEHENGÎ

### KLASÎKOYÊ CHAMPIONS LEAGUE

**BARŞALONA (1) × RIYAL MADRÎD (1)**



**Di** roja Sêşema (3-5-2011) an de, tîma Barşalona bi golekê li hember golekê di klasîko yê Spaniya yê di Champions League de bi tîma Riyal Madrîd re li stada Kamp No maç derbaskir.

Di encamê de Barşalona çû maçê dawîn di Champions League de, ji ber ku berê bi du golan di maçe çûnê de ji Riyal vexaribû.

### LEHENGÊ LÎGA SPANIYA 2011

**LÎVANTÎ (1) × BARŞALONA (1)**



**Di** roja Çarşema (11-5-2011) an de, tîma Barşalona bi golekê li hember golekê di lîga Spaniya de bi tîma Lîvantî re maç derbaskir.

Bi wê encamê tîma Barşalona bû lehengê lîga Spaniya yê sala (2010 - 2011) an û bû sê car li pişt hev û 21 car ku di dîroka xwe de ku lîga Spaniya qezenc dike.

### LEHENGÊ CHAMPIONS LEAGUE

**BARŞALONA (3) × MANŞÎSTER YÛNAYTÊD (1)**



**Di** roja Şemiya (28-5-2011) an de, tîma Barşalona bi 3 golan li hember golekê di faynelê Champions League de ji tîma Manşîster Yûnaytêd yê Inglîzî vexwar û bû lehengê Champions League yê sala (2010 - 2011) û çaremîn car di dîroka xwe de.

## MÎLAN LEHENGÊ LÎGA ÎTALIYA 2011

**ROMA (0)**

**×**

**MÎLAN (0)**



**Di** roja Şemiya (7-5-2011) an de, tevî ku maçê di navbera herdu tîmên; Mîlan û Roma di lîga Îtalî de bê gol derbas bû, dîsa tîma Mîlan bû lehengê lîga Îtaliya di sala (2010-2011) an de, ji ber ku tenê xalek bi Mîlan gereg bû ku bibe leheng.

Ji sala 2004 an de ev yekemîn care ku Mîlan lîga Îtaliya qezenc dike û 18mîn car di dîroka xwe de.

## MANŞÎSTER LEHENGÊ LÎGA INGILTERA 2011

**BLACBERN (1)**

**×**

**MANŞÎSTER YÛNAYTÊD (1)**



**Di** roja Şemiya (14-5-2011) an de, tîma Manşîster Yûnaytêd yê Inglîzî bi golekê li hember golekê bi tîma Blacbern re di lîga Inglîzî de maç derbaskir, lê tevî wê encamê dîsa Manşîster Yûnaytêd bû lehengê lîga Ingiltera yê sala (2010-2011) an, ji ber ku tenê xelek jê re divabû. Manşîster bû yekemîn tîm di dîroka lîga Inglîzî de ku ev bû 19 carin lîga yê qezencdike.

## ENTER LEHENGÊ CUPA ÎTALIYA 2011

**ENTER (3)**

**×**

**PALÊRMO (1)**



**Di** roja Yekşema (29-5-2011) an de, tîma Enter Mîlan di faynelê Cupa Îtaliya de ji tîma Palêrmo bi sê golan li hember golekê vexwar û bû lehengê Cupa Îtaliya yê sala (2010-2011) an.